

Ji rayedarên dewletê yên sivîl kes newêre li ser pirsgirêka Kurd tiştekî eşkere bibêje

## Pirsgirêka Kurd wek agir e!



### *Osman Sebrî çû ser heqîya xwe*

**H**ozanê mezin Osman Sebrî di 88 saliya xwe de, li bajarê Şamê, roja 12'ê Cotmehê wefat kir. Osman Sebrî hevalbendê Mîr Celaldet Bexirxan, nivîskarê Hawarê bû. Wî her tim ji bo doza gelê Kurd kar kir û di zindanê her çar dewletê ku Kurdistan dagir kirine de, raza.



Osman Sebrî

**L**i Tirkîyeyê pirsgirêka Kurd naşibe tu pirsgirêkê. Girîngî û tesîra wê jî serdestê hemû pirsgirêkan e. Wisa bûye ku êdî pîvana demokrasiyê, cesareta tevdana vê pirsgirêkê ye. Generalên Tirk rê nadin tu kesî ku bi meseleya Kurdî re eleqedar bibin. Gera Tansu Çiller a dawî careke din eşkere kir ku, çareserkirina vê pirsê hê jî di destê generalan de ye. Serokwezîra Tirkîyeyê Tansu Çiller, di vegevî de ji tirsa generalan înakar ku, li Viyanayê li ser vê mijarê peyiviye.

**P**irsgirêka Kurd li Tirkîyeyê mîna agir kî dest diavêjê xwe dişewitîne: Mirovîn ku dibînin ev pirsgirêk bi destê artêşê çareser nabe û li gorî xwe li dû çareseriyen siyâsi digerin, zû an dereng ji cihê xwe dibin, an jî bi destê kontrgerîla têne kuştin. Hin ji wan jî piştî ku ji aliyê artêşê ve têne tehdîtkirin, ji pêşniyarên xwe vedigerin û êdî der barê pirsgirêka Kurdî de nema dengê xwe derdixin û vê pirsgirêkê bi temamî dispêrin Artêşa Tirk a ku jî pest û zordariyê pê ve tişteki din nizane

## Kurd bi koçberiyê jî ji devleta Tirk xelas nabin

**Welat Zaxo** - Kurdên ku ji Bakur ji ber pêkutiyên dewletê ku gundên wan hatibûne şewitandin û koçberî başûrê Kurdistanê kîribûn. ji aliyê KT'ê ve ji paş ve têne xwestin. Rayedarên dewleta Tirk, ji bo ku Kurdên koçber ji nû ve vegeñin Bakur, bi partiyên YNK'ê û PDK'ê re hevrûniştinan pêk anîn.

Kurdên başûrê Kurdistanê li hember vê daxwaza

KT'ê rabûn, li ser vê yekê YNK û PDK ji bo ku, Kurdên Bakur di kampan de bicivinin, pêşniyar birin rayedarê KT'ê. Ji bo cihê kampê jî PDK'ê herêma Zelê, YNK'ê ji herêma Akyreyê pêşniyar kirin.

Li gorî plana KT'ê û Hikûmeta Başûr, dê Kurdên ku ji Bakur koç kirine, di kampê wek ên Filistîniyan de bêne berhevkirin.

Hevditinê ji bo avakiri-

na kampê berhevkirinê, ji 10 roj berê ve li Dihokê dest pê kirin. Kesênu ji istixbarata Tirkîyeyê besdarî civînê dibin, şertê ku ev civîn gere bi dizî bimîne didin ber nûnerên PDK'ê û YNK'ê.

Li ser vê yekê Kurdên ku ji Bakur koç Başûr kîrine daxuyandin ku, dê li hember biryareke bi vî rengî bisekinin û li ber xwe bidin.

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Behdînan: Kela tirsê û zindana gel

Rûpel 14

Erbakan jî xwe spart generalan

Rûpel 5

Niviskarê destana 'Leyl û Mecnûn'

Seyitxan Qurij

Rûpel 13

Dîlber û Çiller

Abdurehman Durre

Rûpel 13

Ji Sêwazê bi wir ve çek û leşker hene

Rûpel 9

Di nav gelê me de efsaneyâ kulê

Rûpel 11

Ziman, çand û politika

H. Sefkan

Rûpel 10

# Hozanê Kurd Osman Sebrî

Ey hozanê hêja, tu ji kanya esîl  
Lawê Kurdên merd î, ji bingeha arî  
Ji bo gelê xwe yê hejar bindest û dîl

Navê te wê tim bilind be tu nemir î  
Tu nemir î hozanê Kurd Osman Sebrî

Nivîskarê 'Hawar' û hozanê bi deng  
Tu xwîniyê welat î, dilsot û pereng  
Pişti te re wê bidome ev şer û ceng  
Ji bo gelê Kurd betal ke qîr û girî

## NİŞANA BERXWEDANÊ

Apê Osman!...  
Hey dengê her bilbilekî  
helbesta her helbeste vanekî  
navê li ser her zimanekî...  
Nebêje; "Roniya çavê min  
kêm bûye  
guhêñ min giran bûne."

Ji roja tu hatî jînê ta iro  
tu hêviyên bav û kalan  
di çavêñ me de ges dikî...  
Berxwedanê  
di rahêñ me de xurt dikî...

Evîna Kurdistanê  
di dilê me de kûr dikî...  
Peyva "Welat"

di guhêñ me de xweş dikî...  
Apê Osman!...  
Hey vîna xurt

gotina rast û durist  
di rojêñ teng û dijwar de...  
Çiraya ronak

mûm û finda ges  
di şevêñ reş û tarî de...  
Nebêje : "Ez pîr bûme  
ezê bimrim."

Tu di cerg û dilêñ me de  
di hişen me de  
herdem ciwan û sax î...  
Apê Osman!...

Hey şûrê Ristem  
Çakûçê Kawa  
şagirtê Şêx Seîd û Doktor

Fuad  
Nebêje : "Ez ne xwenda me."  
Tu dibistana xwendin û zanînê  
yî

Soreşa his û mejî yî  
Va ye destekî te dibêje:  
"Tim pêniyîñ di nav tiliyîn  
min de bû..."

Destê te yê din dibêje:  
"Tim li ser tivingê bûm..."  
Lingekî te dibêje:  
"Her dem li ser ciya bûm..."  
Lingê te yê din dibêje:  
"Her dem di zîndanan  
de bûm..."

Herdu çavêñ te dibêjin:  
"Tu carî em ji girtinê  
ji birçibûn û mirinê  
netirsîyan û natirsin..."  
Apê Osman!...

Mamosteyê mamosteyan!...  
Tu dibêjî:  
"Ez mirov im, paşê jî Kurd  
im"

Ez jî dibêjim:  
Tu nişan î  
Nişana mirovahiyê  
Kurdîtiyê berxwedanê

Rûxwes

Navê te wê tim bilind be tu nemir î  
Tu nemir î hozanê Kurd Osman Sebrî

Kalê heştê salî, şoreşgerê ciwan  
Dilşewatê 'şerê gel' doza Kurdistan  
Li ser rîça te dimeşe Jîr Dilovan  
Ser wê rîça ronahî bîr û bawer î

Navê te wê tim bilind be tu nemir î  
Tu nemir î hozanê Kurd Osman Sebrî

**14 Cotmeh 1993 / Jîr Dilovan**

## Roj baş gerilla

Ka ez nizanim ezê ji ku  
derê dest bi nivîs û gotarêñ  
ji bo we ciwan û şoreş-  
gerêñ pak û delal bikim.  
Ezê bêjîm roj baş, lê ez ji  
wê jî têr nabim, ez dizanîm  
ew têra we nake. Vê carê,  
ez ji can û dil dibêjîm hemû  
roj û şevêñ we xweş, şo-  
reşgerêñ qehreman, rîber  
û pêşengêñ gelê jar û we-  
latê mêtîngîh.

We dîsa bi fedekarî, bi  
aştîxwazî xwe derxist holê  
û xwe bi hemû neteweyê  
dinê careke din da nasîn.  
Mijokdar bi derewêñ cur  
be cur rûyê xwe mîna jînê  
fahîse boyax kirin, ji bo ku  
li pêşberî gelê xwe û dew-  
letêñ cîhanê xweşik nîşan  
bidin. Her metod û hîle bi  
kar anî, qoz û çeka wî ya  
herî mezin jî ev bû, lê dîsa  
jî serfiraz nebû. Rûyê wî yê  
reş û ew nonoştiya di bin  
boyaxa fahîsetiyê de vesar-  
tibû carake din derkete  
holê û neyar careke din  
bêçare ma, mîna sewalêñ  
dar li serî ketî kor û gêj bû.  
Belê vê carê baş diyar bûye  
ku, neyar gelek jar bûye û  
nikare xwe li ser lingan bi-  
gire, ev jî xurtbûna gerila  
diyarî gel dike. Kedxwar  
baş têghîştine ku, êdî te-  
menê wan li Kurdistanê  
gelek kurt maye. Bi provak-  
asyonêñ xwe yêñ hov ni-  
karibû baweriya gel bi-

sikêne û niha baş dizane  
ku, nema dikare baweriya  
bi yekîtiya sîh-çil mîlyon  
Kurdî hatîye pê, dabixe û  
kela raperîñ û têkoşînê ne-  
ma dikare hilweşîne, baş  
têghîştîye ku, nema dikare  
rêxistina PKK'ê tasfiye bi-  
ke. Êdî civaka Kurd bi  
têkoşîna rizgariya netewe-  
ya Kurdistanê hatîye gu-  
hertîn, hemû dest dane  
hev û bingehê têkoşînê roj  
bi roj, kêlî bi kêlî xurttir û  
gestir dikin.

Ewil dilop bû, bû rûbar,  
bû gol, bû derya û êdî bûye  
oqyanûs. Pîsî, kirêti û xayî-  
niyê da ber pêlén xwe û  
rûpeleke nû vekir ji çîna  
karker re, bû rûmeta cot-  
kar, gavan, koçer, gundî û  
zarokên li ber dîwaran. Ni-  
ha hemû Kurdistan dilpaqîj li  
Kurdistanê bûne xwediyê  
rûmeteke gelek mezin, ev  
ji fedekariya hemû têkoşer  
û şervanêñ têkoşîna aza-  
diyê tê, pêwist e em hemû  
Kurd, ev kiryarêñ qîz û  
xortêñ ku ji nav dilê me  
der hatine û ala rûmetê hil-  
dane ser milê xwe, tu car ji  
bîr nekin.

Bimînîn di xweşiyê de  
têkoşer, leheng û nemirêñ  
qada şer/ Gul û nêrgîzen li  
ser ciya/ Sevreşen xewna  
dagirkeran.

**Kedkar Çîn/ Dêrika  
Çiyayê Mazî.**

## Serê gelê me sax be

Mamosteyê me yê mezin û bi  
rûmet **OSMAN SEBRÎ** di 88  
saliya xwe de nemir bû. Apo! Em  
bi te û xebatêñ te yêñ li ser ziman,  
wêje û welatparêziyê  
serbilind in. Tu ji me re roniya di  
tariyê de bûyî. Bila serê me tevan  
sax be

**Enstituya Kurdî ya li Stenbolê**

## Nivîsara Welat

### Ev têkoşîn ji bo çi ye?

Dî dema iro de navgînê ragihandinê yêngirseyî  
wisa bi pêş ketine ku, lingê civîkekî li çola Avus-  
tralyayê bîşkê wê dengê qırçîna wê bigîhîje Afrî-  
kayê. Di demeke wiha de bandora çanda gelekî li ser  
çanda yê din tiştekî pirr xwazahî ye.

Bi rastî, di warê çandê de danûstandina gelan, ger  
di şertîn wekhev de çêbin, wê mirovahiyê jî gelek bi  
pêş ve bibe. Bes mixabin ne di dîroka mirovahiyê ya  
kevin de, ne jî di ya nûjen de ev şert û rewşen wekhev-  
iyê nebûne nisîbê mirovahiyê. Ji ber vê yekê danû-  
standinê nav gelan, êdî zehf berjewendiya aliyekî der-  
dixe pêş, aliyê din jî ji mecbûrî di bin tesîra çanda yê  
serdest de dimîne, dû re jî êdî bi tu awayî nikare xwe ji  
çanda serdest xelas bike. Wekî din jî çanda xwe re jî  
dibe biyan.

Ji wan gelên ku ne di şertîn wekhev de dijîn û di bin

**Zehfîn Kurdên Bakur  
tevî ku bi Kurdî zanîn,  
dîsa jî serê xwe pê re  
naêşînîn û çawa ku bi  
Kurdî re eleqeder bibin,  
pê bixwînîn û binivîsin  
dibêjî qey wê Tirkiya xwe  
ji bîr bikin. Helbet em ne  
li dijî xwendin û nivîsan-  
dina bi Tirkî ne, lê em  
nizanîn ev ci eşq û evîn e  
ku, ev çend Kurdên  
Bakur bi zimanê Tirkî ve  
girê dide?**

xwe ji bîr bikin. Helbet em ne li dijî xwendin û nivîsan-  
dina bi Tirkî ne, lê em nizanîn ev ci eşq û evîn e ku, ev  
çend Kurdên Bakur bi zimanê Tirkî ve girê dide?

Em bawer in ku, Kurd ji sedî dehê wextê xwe yê ku  
didin zimanê Tirkî û yên din, bide zimanê xwe yê zik-  
makî wê bi sedhezaran xwendevanêñ zimanê Kurdî  
çêbibin.

Dema tu vê ji van kesen ku Kurdî dijwar û zehmet  
dibînîn dipirsî, dibêjin, "Ma ziman ci ye, wê ziman me  
rizgar bike?" Em jî dibêjin ma nexwe têkoşîna ku iro  
gelê Kurd dide ji bo çi ye? Ne ji bo bidestxistina çand,  
ziman û hemû berhemêñ Kurdistanê ku, iro di bin dest  
û pesta dagirkeran de talan bûye û hê jî tê talankirin?  
Dawî em vê dibêjin, ziman ne her tiş be jî cihê wî pirr  
girîng e di bidestxistina serxwebûn û azadiya welatekî  
de. Zimanêñ din jî ji me re pêwist in, lê pêsiya hemû-  
yan zimanê me.

## Tê di dilê me de bijî

Stêrka wêje û zimanê Kurdî  
**OSMAN SEBRÎ** ji dilê me  
xuricî.

Apê Sebrî bi xebat û jiyana xwe  
ya bi êş, xwe di dilê me de  
nemir kir.

Bila serê gelê me sax be.

**Xebatkarêñ Rojnameya Welat**

## NÜÇEYÊN CENGÊ

*Di heftiya dawi de ji her alyî ve ser, ges, gurr û dijwar bû. Hem gerilayên ARGK'ê lirbaziyêne xwe li hember saziyêne dewletê û hevalbendêne wê zêde kîrin, hem ji hêzêne dewletê bi êrîşen xwe yên hovane gelek gund û destêne Kurdistanê dan berd bombeyan û şewitandin. Büyerêne heftiya dawî evin:*

**7 Cotmeh 1993:** Li Batmanê li nehiya Yücebağe ku li ser navçeya Sasonê ye konvoyeke leşkeran, ku ji oparasyonê diziviri kete kemîna gerilayê ARGK'ê, ser 2 saet dom kir. Der heqê kuştî û birindar de tu agahî nîn in.

Servanê ARGK'ê Li Cûlemêrgê li navçeya Kulabanê êrîş bire ser qereqola Miliyê ku niha nêzîkî gundê Mele ye, di navbera leşker û gerila de ser derket, der heqê kustiyan de agahî nayê standin. Di eynî saetê de gerila li gundê Rubozicê rê biri, bi navê Ramazan Enco cerdevanek revandin. Erebeye cerdevan Nimet Sak hate şewitandin. Konvoja leşkeran ya ku ji ber hewara cerdavan dihate cihêne bûyerê kete kemîna gerila leşkerek hate kuştî û 4 leşker û cerdevanek birindar bûn.

Li Silopiye hêzêne dewletê di taxêne navçeyê de operasyon pêkanîn û li dor 100 kesi xistin bin çav. Gerilayê ARGK'ê li Bûlanixê avêtine ser gundê Gulova, lojmanê mamosteyan û dibistan şewitandin. Li Dêrsimê hêzêne dewletê daristanêni li dora navçeyê Kisîlê û Pûlûrûne dişewitînin. Li Ruhayê navçeya Xelafeti gundê Yükürgökliyê hêzêne dewletê avêtin ser malekê 2 gerila û gundiye kustîn. 2 leşker ji birindar bûn Li Çepêkçûrê li gundê Çawîşlar û Elmaliyê di navbera cerdevan û gerila de ser derket 15 gerila û 3 cerdevan hate kustîn.

**8 Cotmehê 1993:** Li Wanê 3 gundê cerdevan ku niha li ser navçeya Şaxê ne, servanê ARGK'ê avêtin ser wan 8 leşker û 4 cerdevan 13 kes kuştîn. Gerila ji aliyeke din de jî 11 kes revandin, di nava van de birayê serokê partiya DEP'ê ikram Öcek û melayê gundê Daxbastiyê jî hene.

Operasyonê dewletê yên ku li Agirî û Tendürekê didomin, derbasî navçeya Qersê Qaqizmanê bûn. Li gorî agahîyen fermî cihêne sênayî yên wek Gezgez, Çemç, Cümacay, Bêraj sewqiyeta leşkeran dom dike. Cihêne ku lê operasyon didomin li wir gelek kes hatine girtin. Ji ber operasyonan, gundê Kezo, Hecîxalit û Çoban bar kîrin. Li Agiriyê, li navçeya Gihadînê servanê ARGK'ê ajanek kuştîn. Hêzêne dewletê li çiyayê Govendê ku niha di navbera Cûlemêrgê û Bêşbabê de ye operasyoneke dorfirê pêkanîn. Li hember gerilayê ARGK'ê bi hezaran leşker û cerdevan û diken.

Li gorî ajansa A.A yê gerilayê ARGK'ê di saet 20.00'an de avêtine ser bajarê Mûsê, tirafoya bajêr şewitandin. Li ser vê bûyerê dewletê 4 roj ceryan neda bajêr. Di navbera Cûlemêrgê û Celê de li hêla Cemkan gerilayê ARGK'ê rê biri û erebeyeke Nexwaşxwana Cûlemêrgê ya dewletê, 3 erebeyê rê, erebeyeke berpirsyarê wezareta perwerdehiyê şewitandin û 2 kes jê revandin.

Li Dêrsimê li gundê Pirinci ku li ser navçeya Pertekê ye 4 mamoste ji aliye kîrin ve hatine kuştîn.

**9 Cotmeh 1993:** Gerilayê ARGK'ê êrîş birin ser qereqola cendirmeyan ya Asmakayayê ku niha li ser navçeya Cûlemêrgê Darahêne ye, astagmenek û 2 leşker kuştîn.

Li Mêrdinê li navçeya Qoserê erebeyeke belediyeke ya gemarê ji aliye gerila ve hate şewitandin.



Bi pesta dewletê re hejmara gerilayen jî zêde dibe

Wêne / Seyit Çiya

Li Midyadê gerila êrîş bir ser şantiye-ya rîçekirinê 3 makîneyen kar û otomobilekê şewitandin

Li Çepêkçûrê li navçeya Darahêne operasyonê dewletê didomin, operasyon bi tanq û panzeran û bi 2000 leşkerî ve pêk tê. Operasyon li gundê Ziktê, Çevirmê, Yenisuyê diqedin.

Li Erzinganê gundê Rûmekerkê hinek kesen nenas bi navê Zarif Yûksel gundiye revandin. Li Diyarbekirê navçeya Cingûse gundê Migranê 3 kes hatin kuştîn, ev bûyer ji aliye gerila ve hat pêkanîn. Li Bilisê li Tetwanê li Zozanê Kotimê erebeyeke cerdevan di zinar de wer bû, yên ku hatin hewarê ji aliye cerdevan ve hatine gulebarankirin.

Li ser riya idil Midyadê şantiye-ya ku rê û qîr cedîkir, gelek hacet û erebeyen santiye-ya ji aliye gerila ve hate şewitandin.

**10 Cotmeh 1993:** Li Amedê 2 erebeyen dewriyeke yên leşkeriyê ketine kemîna gerilayê ARGK'ê di bûyerê de 9 leşker hatin kuştîn.

Gerila erebeyeke polesan ku li herêma goristanê dewriye digeriya dane ber gulleyan. Li Diyarbekirê li navçeya Çermükê li herêma gundê Sîntê di navbera hêzêne dewletê û gerilayê ARGK'ê de ser derket 4 cerdevan û 4 gerila hatin kuştîn. Li Bismila Diyarbekirê gundê Kerxê gerila bi Roketavêjan ve êrîş bire ser malekê isabet hilda û jînek hate kuştîn. Gerila li herême istasyoneke ben-

zinê ji şewitand.

Li Ruhayê di navbera Siwêreg û Wêransarê de di navbera hêzêne dewletê û gerilayê ARGK'ê de ser derket 10 gerila hate kuştîn. Li wanê li navçeya Şaxê 13 cerdevan ku ji aliye gerila ve hatibûn revandin, jê ses kes hatine berdan.

**11 Cotmeh 1993:** Li idirê hêzêne dewletê avêtin ser 5 gundan, li navçeya Aralixê Gomikê ji, ji aliye leşkeran ve hate hilweşandin. Leşkeran avêtin ser gundê Xoşxeber û Panîkê ku niha li ser navenda idirê ne, li gundiyan tahde kîrin û gelek mal û cihêne kar dane ber gulleyan. Wek 3 milyarı xesar cêbûye. Li gundê Xoşxeberê hêzêne dewletê 2 jî xistin bin çav. Muxtarê van gundan ji aliye leşkeran ve hatine işkencekerin û dûre hatine berdan. Hêzêne dewletê li Alîxê bi du êrîşan ve hemû mal û dezgâyên gundiyan hilweşandin û gelê gund ji cihêne wan dane qetandin. Li gundekê idirê Alkamerê timen taybeti êrîş bire ser malekê, bi navê Koçer Karadeniz, Zübeyde Bakış, Sevim Bakış 3 kes girtin, ji vana 2 kes hatin berdan, Sevim Bakış berndan.

Li Çepêkçûrê, di navbera navçeyen Adaklı û Karakocanê de gerilayê ARGK'ê otobusek dan ber gulleyan. 5 leşker kuştîn û 24 leşker ji birindar bûn.

Li Wanê, li navçeya Saxê (Catax), li çiyayê Kato di navbera hêzêne dewletê û gerilayê ARGK'ê de ser derket, di vê

bûyerê de 2 astsubay, 4 leşker hatin kuştîn. Ew leşkeren ku hatin hewara wan ji, li mayinê gerilayen qelibin û li vir jî 2 astsubay û 8 leşker mirin.

Li Farqînê, li gundê Hêlinê gerilayen ARGK'ê êrîş birin ser qereqola gund. li wir di navbera leşker û gerilayen de ser derket û 6 leşker hatin kuştîn. Pişti vê bûyerê hêzêne dewletê avêtin ser gundê Kiriçtepe cûn û hatina gund qedexe kîrin. Li Şaxê li gundê Xumarêt 6 cerdevan ji aliye dewletê ve hatin girtin û pişti ifadeyê wan hatinstandin, ew berdan. Kargeha Bal ya Çırçirê ku niha di navbera Amedê û Ruhayê de ye ji aliye gerila ve hate şewitandin. Avahiya ku TEKELE û wek depo dixebeitand hate şewitandin.

Li Agiriyê, li navçeya Patnosê, meyxaneyek hate şewitandin. Li Dêrsimê, li navçeya Malkisi (Çemîgezek), li Doganê hinek kesan êrîş birin ser mala Veli Kahraman, ew û du kecêne wî kuştîn.

**12 Cotmeh 1993:** Operasyonê dewletê, yên başûrê Kurdistanê didomin. Gundê nêzîkî sînor ji aliye KT'ê ve têne bombekirin. Li Cûlemêrgê, li navçeya Geverê komvoyek leşker ketin kemîna gerilayen ARGK'ê 2 astsubay, 5 leşker mirin û 2 leşker ji birindar bûn.

Li Sirnexê gundê li ser navçeya Bêşbabê Sarasîn, Gökce ji aliye hêzêne dewletê de têne bombekirin. 2 kes hatin kuştîn. Li Mûsê Bûlanixê dibistanen gundê "Sögütlü", "Kîlçî" û "Arıncak" ji aliye gerilayen ARGK'ê ve hatin şewitandin. Li Bûlanixê timen taybeti otobosek dane ber gulebaranê, soferê otobosê hate kuştîn. Li ser riya Xizan û Gelîyê Memîran de minibuseke cerdevan li mayinê qelibî, di bûyerê de 2 kes hatin kuştîn, 2 kes ji birindar bûn.

Li Sasonê konvoyeke leşkeran ku bi 10 erebeyan ve dihate holê kete kemîna gerila, erebeyeke rûxiya 10 leşker ji hatin kuştîn. Li gundê Elmaliyê 7, li gundê Akrakê ji 7 cerdevan çek danîn. Li Piranê li gundê Nerdeyê gerila rê biri 2 cerdevan û bireyê sercerdevanekî revandin.

Li Çepêkçûrû li navçeya Darahêne gerila êrîşek bir ser qereqola Gaziköy, di bûyerê de leşkerek hate kuştîn û 2 leşker ji birindar bûn.

Gerila li ser riya Licê û Amedê rê biri 2 qamyonên mercedes û 2 jîp şewitandin. Gerilayen ARGK'ê li Mêrdinê li navçeya Qoserê traktoreke belediyeke şewitandin. Erebeyeke TEK'ê li ser riya Qulp û Licê hate şewitandin. 5 karker hatine revandin. Gerila riya Qılıbanê û Kasûrê biri jê 2 cerdevan û 7 kes revandin, texsiyeke cerdevan û şewitandin. 4000 fişengen ku ji basûrê Kurdistanê ji cerdevanen Qilaban û Roboskî re hatibûn, gerila dest da ser.

**13 Cotmeh 1993:** Li Wanê, li navçeya Elban, 4 gund ji aliye hêzêne dewletê ve hatin valakirin. Li Cûlemêrgê 200 cerdevan çek danîn.

Li Sirnexê hêzêne dewletê sê gundan ber topan. Di van bûyeren de kecêk birindar bû, mizgeft û dêrek ji xesar dîtin. Li Ruhayê, li Wêransarê, li gundê "K. Altınbaşak" ê ku 7 gerila jê hatibûn kuştîn, fermandariya ARGK'ê ya Eyaleta Tolhîdanê bi belavokekê, dibistan da dan.

Li Mûsê, li navçeya Melzîrê gerila, li ser sérêyekê dest danî ser 1000 nasname û 500 ehliyetan û ew birin.

Li Mazrayê (Eleziz), li navçeya "Alacakaya", li ser ixbara sixuran, hêzêne dewletê êrîş birin ser komek gerila, 3 gerila kuştîn. Li Çepêkçûrû, li navçeya Kixiyê gerilayen ARGK'ê êrîş birin ser qereqola polisan, polisek birindar bû, qereqol ji xesiri.


# DYA dixwaze ji Somaliyê derkeve

**Nûçeyên Derve-** Amerîka pişti derbeya ku, di 3'ye mehê de ji afgirên Aîdîd xwar, hê fémkir ku, ketiye dafikekê. Niha jî nûneren DYAYê hewl didine xwe ku, xwe ji vê dafikê rizgar bikin.

Roja 3'ye Cotmehê hêzên DYAYê agahdar dibin ku, dê hêzên Aîdîd li Hotêla Olimpik civînekê li dar bixin û diavêjin ser vê civînê. Di vê cerdê de, hin jî mirovên Aîdîd ên girîng dikevin destê hêzên DYAYê, lê derbeyeke mezin jî, li leşkerên Amerîkî dixin. Di cerdê de 17 leşkerên Amerîkî mirin, zêdeyi 70 leşker jî birîndar bûn. Hêzên Aîdîd 2 firokeyên Amerîka jî daxistin û 8 leşker jî dil girtin. Di vê bûyerê de 20 kes jî ji Somaliyan mirin.

Ev bûyer di nav gelê Amerîka de tırsa Wietnamê, nû kir. Berpeyiyyen (reaksiyon) gel bilind bûn. Clinton li hember reaksiyonla gel, pişti guftugoyen tund biryara zêdekira leşkerên li Somali stand û ev biryar ji Senatojê jî derbas bû. Hin ji senatoran daxuyandin ku, ger Clinton leşkerên Amerîkî ji Somali venekişne, dê pereyên ku, ji bo vê operasyonê hatine veqetandin bi temamî bibirrin.

Li gorî lêpirsinen hin kovarên Amerîkî, mirovên Amerîkî, ji sedî 86 vekişna ji Somaliyê dixwazin. Ji van kesan ji sedî 60 dibêjin bila vekişin di demeke kurt de pêk were. Li ser berpeyiyyen gel û Senatojê Clinton daxuyand ku, dê leşkerên xwe heta 31'ê Adara 1994'an ji Somaliyê vekişinin.



Leşkerên DYAYê Zarokên Somaliyî têrme-kirin lê laşê wan şewitandin

berpeyiyyen gel û Senatojê Clinton daxuyand ku, dê leşkerên xwe heta 31'ê Adara 1994'an ji Somaliyê vekişinin.

Hedefen ku, Amerîka dabû pêşıya xwe jî bi teamî diguherin. Niha xwe-xelaskirina ji dafika Somali bûye he-

L i gorî lêpirsinen hin kovarên Amerîkî, mirovên Amerîkî, ji sedî 86 vekişna ji Somaliyê dixwazin. Ji van kesan ji sedî 60 dibêjin bila vekişin di demeke kurt de pêk were. Li ser berpeyiyyen gel û Senatojê Clinton daxuyand ku, dê leşkerên xwe heta 31'ê Adara 1994'an ji Somaliyê vekişinin.

Ev ji diyar dike ku tırsa Viyetnamê di dilê gelê Amerîkî de cih girtiye û naxwaze careke din bikeve rewşa xwe ya li viyetnamê

defa wan a yekemîn. Ji bo vê yekê jî, rizgarkirina leşkerên dîl bûye problemeke mezin.

Di destpêka dagirkirina Somaliyê de, her çiqas Amerîka armanca xwe wek pêkanîna wezîfeyhîn insanî nîşan dabû jî, dixwest hin berjwendiyen a-

borî û siyasi pêk bîne. Lê berxwedana gel rî nade ku, ev tîst pêk were. Jix-we gelê Amerîka naxwaza bikeve da-fikeke wek ya Wietnamê. Ji sedî 96'ên gelê Amerîkayê rizgarkirina leşkerên dîl, ji bo çareseriya pirsgirêkê û vekişna ji Somali wek xala yekemin dibîne. Kesen ku destavêtina Amerîkayê ya pirsgirêkên derveyî di cih de nabînîn jî, ji sedî 51 in, ev yek jî ji bo pêseroja Pergala Nû, ne tiştekî baş e.

Niha DYAY dixwaze barê Somali li ser milen NY'ê (Neteweyen Yekbûyî) û hînek dewlet Afriqi siwar bike. Serrawestina ku Aîdîd ilan kir ji bo DYAY yê derfeteke mezin e. Lewre nûnerê Amerîka Robert Oakley dest bi gera aştiyê kir. Serokê NY'ê Butros Gali dixwaze bi alîkariya Serokê Misirê Husnî Mubarek û bi besdariya çend dewletên Afriqi, roja 20'ê Cotmehê li Etopyayê civînek li dar bixe û bi van dewletan bide pejirandin ku, leşkerên Afriqi têkevin dewsâ leşkerên NY'ê. Lê berdevkên Aîdîd daxuyandin ku, naxwazin ev civîn pêk were, nexwe dê rî nedîn vê civînê û heta ku, mirovên Somali yên girtî neyên berdan, ew leşkerên DYAY yê bernadin.

Her çiqas ev daxuyand ji alyî Aîdîd ve hatibe dayîn jî, gera "nûnerê aştiyê" berhemâ xwe da û hêzên Aîdîd roja 14'ê Cotmehê, pilotê firokeyê Michael Durant serbest berdan.

## Kongrey Bruksel bo alîkariyî Kurd



Le Başûr, bo zistan dar ko dekenewe bo sütandin

letiye le layen wilatgeliy Ewrûpa û daûdezgây Ewrûpave bo harîkariy Kurdiy Iraq rîk xira.

Ebrehard Rayin niwêneriy Komeley Ewrûpa gutiy kewa em komeleye ta êsta le seta 60'iy ew harîkariyney pêşkêş kirduve ke dirawnete Kurdiy Iraq.

Em Kongreye ke sê rojiy xayand, deyewê binkeyekiy hemîşeyî bo komele Kurdiyekan le pêtextiy Belçîka bikatewe û hendê piroje cêbecê bikat bo ewey dînîştwanî derbederiy Kerük û Musil û Xaneqîn bigerênewe şîwêniy xoyan. Herwiha deyewê legal hîkmetîyî Ewrûpa rîk bikewê bo ewey programêk dabinê le pênat awedan kirdinewey hezaran gundiye sütaw û rizgarbûn le nîzîkey dû milyon Mîn ke bûnête kospe le rîgey awedankir-

dinewey rûberêkiy firawaniy Kurdistaniy Iraq.

Herwiha hîkmetîyî Kurdistani daway ewey kird ke palawtgeyakîy bicûkiy bidrîtê bo ewey sûteniy û kiroşîniy pêwist bo danîştanwan desteber bikat.

Hem Tofiq wezîriy Hawkariy û Mirovayeti le hîkmetîyî Kurdistaniy Başûr gutiy: "Pêwist e helgirtinîy gemaoy abûrî lesor Iraq be merciy ewe bê rejîmiy Iraq hengawiy dîmukrasî bîhawêjê." Herwiha gutiy: "Eger eme nebê ewa rejîmiy Iraq carêkiy tir degerêtewê ser sitratîciyeti şerîy kîmiyawi û ser û kuştar, eme take çekêke be destmanewe bo ewey Iraqiye pênaçar bikeyn ke hengawiy dîmukrasî helêne."

(Le Rojnamey ALHEYAT ewe)  
12.10.1993

Wergêr: Niwa Hebib

**Nûçeyên Derve-** Danyal Mîtrân jînîy Serokiy Firense û Serokiy Komeley Frans Libertê bangewazî Dr. Potris Xaliyî razgirîyi netewe yekgirtuwekaniy kird bo ewey desbecê bikewête kar le pênat ragirtinîy bomba baraniy gun-dekaniy Kurdistaniy Iraq le layen İranewe û herwiha hîkmetîyî Iraq naçar bikat bo ewey wîzey kareba bida-tewe be nawçê Kurdiyekanîy bakûriy Iraq.

Herwiha gutiy: "Pêwist e xebatêkiy ziyatir bikrê dijîy Kirdewekaniy hîkmetîy İran ke buwete hoy ewey hezaran hawnîstimanîy Kurd le gundekaniy xoyan derbeder bibin.

Em gutaney Danyal Mîtrân lew gutareda hatin ke rojiy yeksemme yarbîrû 11.10.1993 le destpêkiy Kongrey Broksil pêşkêşîy kird. Em Kongrey nîwdew-

## Li Yewnanîstanê PASOK bi ser ket

**Nûçeyên Derve-** Di hilbijartina giştî ya li Yewnanîstanê Tevgera Sosyalîst a Panhelenîk (PASOK) bi ser ket. Pişti ku encama hilbijartînê kifş bû Serokê Pasok'ê Papandreu ji bo avakirina hikûmetê dest bi xebatê kir.

Di hilbijartînê de PASOK ji sedî 46.8, dijraberê wê PDN (Partiya Demokrasiyê ya Nû) ji sedî 39.3 ray standin. Ji bili van partiyen mezin Partiya Komunîst ji sedî 4.3 û Partiya Bihara Siyâsî jî, ji sedî 4.8 ray standin. Parlamentoya Yewnanîstanê ji 300 endaman pêk tê. Li gorî encama hilbijartînê PASOK'ê 170 kursî, PDN'ê 111 kursî, PKY'ê 9 kursî û PBS'ê ji 10 kursî bi dest xistin.

Li gorî çavkaniyêni siyasi sedema bi binketina PDN'ê problemen aborî ne. Li Yewnanîstanê jî, her ku nexwesînê aborî wek; inflasyon, bêkarîti û hwd. zêde dîbin hîkmet berê xwe didin gel û vîbarê giran li pişta wan siwar dikin. Di nav mesrefen giştî de, pereyên ku ji bo xizmeten civakî, wek; av. elektrîk, perwerdeyî û tenduristiyê têne vejetandin, kêm dîbin û bi a-



Andreas Papandreou

rîkirina hînek dezgehîn endustrî û xizmetê, bêkarîti zêde dibe. Ev ji dîbin sedemê ku gel di hilbijartînan de ray nedîn partiya iqtîdarê.

Her çiqas di hilbijartînê de PASOK bi ser ketibe jî, tu kes bawer nake ku dê ji van problemen re çareseriyeke bibîne. Ev reaksiyon (berpeyiyyî) jînêkî li hember pîrozbahîyê alîgirê PASOK'ê, baweriya gel baş tîne ziman:

"Ez tênaçîhîjim evqas pîrozbahî ji bo ci ne. Ji ber ku, ez baş dizanîm, dê mîrê min disa bê kar bimîne û ezê disa di dawîya mehê de di dayîna kîrîya mala xwe de bikevîm tengasiyê".

# Komûtanê Qerargeha ARGK'ê Cemîl Bayik:

# 'Şerê taybetî wê serê Güres bixwe'

**Navenda Nûçeyan-** Komûtanê Qerargeha Navendî ya ARGK'ê Cemîl Bayik ji rojnameya Özgür Gündem'e re, di nav çarçoveya operasyonê dewletê ku, li hember gerîlayen ARGK'ê pêk tê de rewşa şer nirxand û der barê amadekariyên xwe yên ji bo zivistana li pêş me de agahî dan. Welki têzanîn Serleskerê Artêsa Tirk Doğan Güres ji bo kokbirrîna PKK'ê ji rayedarên dewleta Tirk re heta bihara wê bê muhlet danibû. Li hemberî vê biryara Artêsa Tirk ku, dixwazin heta dawiya biharê bi metodên leşkerî pirs-girêka Kurdi çareser bikin, Komûtanê Qerargeha Navendî ya ARGK'ê Cemîl Bayik ji wiha axivî:

"Em zivistanê bêhtir dikarin pêdiyiyan xwe yên sihêtî û lojistik bi dest bixin. Zivistan li Kurdistanê xedar derbas dibin. Lewre ji ev yek ji leşkerên Tirk re dibe problem. Em di wê navê de hemû pêdiyiyan xwe bi dest dixin û ji niha ve me di binê erdê de nexwes-xane û gelek stargeh çêkirine."

**"Serlesker bi van operasyonê ku, dikirin ewle bû, lê weke tê dîtin tu encam nestandin. Zivistanê avantajen me zedetir in. Lewre dê nikaribin tu tiştî bi dest bixin."**

Cemîl Bayik wekî din daxuyand ku, di rojê de li der dora 50 kesî besdarî refen gerîla dibin, lê ev hejmar li gor herêman diguhere û di vê pêvajoyê de bêhtirîn li herêma Serhedê besdarî zede ne.

Li ser operasyonê dewletê yên dorfireh ku, mehek berê li hêla çiyayê Agiri û Tendürekê dest pê kirin û niha ji cih bi cih didomin, Cemîl Bayik daxuyand ku, dewlet di van operasyonan de têkçûneke mezin jiya ye. Cemîl Bayik axaftina xwe wiha domand: "Li Tendürekê 2, li Agiri ji 3



Cemîl Bayik

hevalen me şehîd ketin. Lê ji Artêsa Tirk 33 leşker hatin kuştin. Dema bi vê operasyonê negihîştin armansa xwe dest bi avêtina bombeyen na-palmê kirin. Lê disa ji tu encam negirtin."

Li ser gotina Serleskerê Tirk Do-

gan Güres ku gotibû, emê heta dawiya biharê kokê li PKK'ê bînin ji, Cemîl Bayik wiha got: "Serlesker bi van operasyonê ku, dikirin ewle bû, lê weke tê dîtin tu encam nestandin. Zivistanê avantajen me zedetir in. Lewre dê nikaribin tu tiştî bi dest bixin. Bi yî awayî here, dê Serlesker istifa bike û ev istifa dê ji me re nebe surpîz."

## ŞERRAWESTINEKE NÛ TUNE

Komûtanê Qerargeha Navendî ya ARGK'ê Cemîl Bayik li ser ihtîmala bîrdayîna şerrawestineke nû wiha axivî: "Me di Adara borî de, bi hin mercan şerrawestin ilan kir. Mercen me hê ji derbasdar in. Ger dewleta Tirk li gorî daxwazîn me yên wekhevî û mercen şerrawestina borî hewl bide xwe, dibe ku, em vê binirxîn. Lê wekî din, em bi tu awayî careke din biryara şerrawestinê ya yekalî nastînin."

## PİŞTÎ KUŞTİNA SÎNCAR Ü GIRTINA KAYA

# Pêkutiya dewletê ya li ser DEP'ê didome

**Navenda Nûçeyan-** Li Tirkîye kotekiya dewletê ya li ser gelê Kurd û saziyên demokratik didome. Hêzén dewletê ji aliyekevî ve çiya û baniyan dide ber bombeyan, ji aliyekevî din ve bi hemû hêzén xwe, êrîşan dibe ser rîxistin û saziyên gelê Kurd. Li Kurdistanê di 16'ê ilonê de hinek serokên Belediye-yan, desten xwe ji partiyen xwe kiribûn û derbasî DEP'ê bûbûn vekir. Ev dawe bi hinceta ku, serokên belediye-yan di beyanaten xwe de qala cudaxwaziye kirine vedibin. Dîroka daweyê 20'ê Cotmehê ye.

Li izmirê ji DGM'ye Serokê Partiya DEP'ê yê Manisayê, Ahmet Sağan girt. Ahmet Sağan ji ber axaftina xwe ya komcivîna DEP'a Manisayê, hate girtin.

## Li Parîsê şeva 7 saliya YJWK'ê

**Welat/ Paris-** Di roja 10.10.1993'an de, YJWK (Yekîtiya Jinê Welat-parêzen Kurdistan) ji bo 7 saliya salvegera avakirina xwe şekekê li dar xist. Bi besdariya nêzîkî 1200 kesî, şev di 4'ê êvarê de dest pê kir. Pirraniya besdarân şevê jinêni bi rengê kesk û sor zer xemilandî bûn.

Piştî rîzgirtina bi deqî-qeyekê ji bo giyana şehîdan, şev dest pê kir. Dû re bi a-wayekî fireh rewşa siyasi ya YJWK'ê hate nirxandin û rola jina Kurd hate şîroveki-

rin. Piştî axaftinan grûben folklorê dest bi pêşkêsiya hûnerê xwe kirin. Piştî wê ji, mesajen ku ji şevê re hatibûne birêkirin hatin xwendin û dûre ji şano (tiyatroya) ya ku li ser jiyana Kurdên li Ewrûpa hatibû amadekirin dest pê kir. Ev lîstik bala besdaran gelek kişande ser xwe.

Hunermand Xelîl Xemîn, Tîrêj û Mizgîn bi dengen xwe yên xwes û bi stranen xwe şevê rengandin. Şeva YJWK'ê hate nirxandin û rola jina Kurd hate şîroveki-

# Erbakan ji xwe spart generalan

**Serokê Partiya  
Refahê (RP)**  
**Necmettin  
Erbakan, di**  
**Kongreya Çaremin  
a Refahê de li ser  
pirsgirêka Kurdi ji  
rawestiya, weşan û  
perwerdehiya bi  
Kurdi parast û li  
hemberî fikra fed-  
erasyon û dewleta  
bi serê xwe derket.**



Necmettin Erbakan

rexneyên xwe girtin, kirin û biryaren Çillerê nirxand. Erbakan biryaren arizîkirinji şîband wek kesen ku di quamarê de têk çûbe û malê xwe bi lez û bez derxistibe mazatê.

Beriya kongreyê bi hefteyan çapemeniya devkî û ya nîvîski li ser amadehiyên Refahê yên kongreyê radiwestîyan, didan daxuyandin ku. Refah dest bi pêvajoya xwe nûkirinê kiriye û dixwaze ji partiya bawermendant bifilite, bibe ya girseyî. Her wiha ji bo bidestxistina desthilatê guherînan anîbûne rojeva xwe.

Di axaftina xwe ya kongreyê de parêzvanê "Pergâla Dadî" (Sazûmana bi Adalet) û "Nêriña Neteweyî" Prof. Dr. Necmettin Erbakan çareserkinha hemû gelşen Tirkîye-ye di ramana İslâmî de dît û "Heta ku heqîqeta İslâmî neyê dîtin, ji meseleya Kurdi re çare

# Silê Eysanê û kurê wî Sîno (çîrok)

## Eli Cewdet

**O**tobêsa me ya kevin, ji hênikahiya Torosê, ji Gawirdaxê xwe berdabû Entabê. Germê em li wir zevt kiribûn. Ber bi deşta Ruhayê, kevir û kuçik li me dibariyan, em dikelandin. Te digot qey otobêsa me bûye sitilek mezin û li çar aliyan me ar dada-ne me dikelinîn.

Sofêre me yê lêqewimî, li serê pira Birecikê bangî me rîwiyan kir: "Ji vir û wê de em dikevin riyeck xetere iñiñ ji we ev e ku navnasê xwe amade bikin. Bi leşkeran û polisan re pevcûnê nekin. Yen kal û pîr û zarok; tırsa min ji we nîn e. Tırsa min ji xortan e" got. Hilmek stand û domand: "Xorten ku di desten wan de pirtûk û rojname hene bila vesérin. Ü bila herkes xwediyê li baxaca xwe bike. Me hemûyan bi xwe re neşewi-nin."

"Sofêr êdi dengê xwe hûr kiribû û bi dengekî berger ji me re digot: "Ez hêviyê ji we dikim, bila serê me neêse. Ne şeyten bibînin û ne naletê lê binin. Xwedê tu kesi neke tora van bêdin û imanan."

Sofêr me pişti ev gotinên xwe qedandin dest bi axaftina Tirkî kir. Kêm. zede bi Tirkî-yeck neçê ev gotin bi Tirkî ji a-nîn zimên. Bala min kişand, di Tirkîya xwe de bi nebaşı qâli polis û cendirman nekin.

Ji rîwiyan yekî got. "Qap-tan, lê terorist in, çin in ew bêne eme ci bikin?"

## EW NE TERORIST IN

Sofêr: "Ew ne terorist in, ew keç û xorten me ne. Ew tu tadê li kesi nakin. Bila tırsa we ji wana tune be. Ew dij-minen qoriciyan, cendirman û timen taybeti nin. Ew bi xwe li himber neheqiyê rabûne ser piyan."

Sofêr ev peyvîn xwe ji dil, bes bi tırs digotin. Wî zanibû wê ci bêye serê wî. Fesad pirr bûn.

Yekî kal şewqa xwe xwar kir. Xwe ber bi sofêr pêş da û got: "Law welle em ji wan ji ditirsin"

Cend rîwiyan bi awirên tırs bala xwe dan kalo. Kalo dirêj nekin. Li cem kalo, yekî ku gotibû ez mele me rûniştibû. Mele zivîri ser kalo û bi kure-pist jê re hin tişt gotin. Di nav re dengê kalo dihat. Digot "De lawo kijan bi xêr be bila xwedê wê bike."

Di vê sala dawîn de ev ca-ran çenda ye ez diçime gundê xwe nizanim. Ji hejmar der-ke. Ji çend mehan carekê diçime serxweşîya malekê. Tu roj tune ku şehîdekk nayê dayin. Xorten ciwanmîr yek bi yek, ji bo xewneke rewnaq di-kevin ardê. Bav û kalan axeke bi asteng, jiyanekê dijwar spartîye vî qirnî.

Vê carê ji ez diçüm ser xweşîya "Silê Eysanê". Em cî-rangundên hev in. Silê bêbav

mezin bûbû. Bavê wî li serê ti-xûb hatibû kuştin. Karê wî qaçaxî bû. Malbateke bêkes û feqîr bûn. Pişti kuştina bavê Silê, diya wî ya reben Eysanê bi parsê ketibû. Silê bi navê diya xwe dihat gazikirin. Ev bûbû sedema qerfan. Silê Eysanê vir de, Silê Eysanê wir de.... Eysanê bi halekî xerab, zikekî têr duduuyen birçi, Silê mezin kiribû. Gava ku dema zewacê hat, Silê zewicî. Tew bîra xwendinê mendinê nedibirin. Jina Silê Mekiye ji, ji maleke bêkes bû. Mekiye bi xêr û destûra Xwedê lawek welidandibû.

Silê ji serê biharê û heta dawiya payiza dereng li Edenê dixebeitî. Emeleti der dikir. Serê zivistanê dizivîrî gund. Dawiya zivistana sar û şevdirêj nedihat. Silê li Edenê hînî çend herfîn Tirkî bûbû. Xwendina wî qasî cila xwe ji avê derxe, bû. Xwestina wî ya mezin xwendina kurê wî Sîno bû. Digot: "Min nexwend qet nebe bila Sîno bixwîne." Digot: "Ez dixwazim Sîno bibe

Bi salixdana mamosteyê ji Qastamonyê kurrê xwe Sîno şand dibistana dewletê ya be-laş. Xwendin, razan, cil, xwa-rin û hewcîyên dibistanê hemû li ser dewletê bûn.

Silê bi van pesnê xwe û yê Sîno dida. Wî zanibû bi van belaşyan di salekê de çiqas kar li Silê dibe.

Sîno sala yekemîn li vê di-


bistanê xwend. Ji bo havîngê zivîrî hate gund. Ci bû wê havînê bû. Dawiya havînê Sîno lingê xwe da erde. Nedixwest biçe wê di-bistanê. Digot: "Min bişînîn dibistana qezayê. Mala xalîfîka min li wir e, ezê li ba wan bi-mînim."

Eman yeman Silê, Sîno qanî nekin. Silê çû ba mamoste. Mamoste hate malê. Berger, şîret û tırsfirandinan tiştek ha-sil nebû. Mamoste Silê xewle

Got: "Ev kurê te yî biaqil ji rî derketiye. Tırsa min tero-rîstan xwe gihandibê. Ew dij-minen we ne. Tu dîbînî ci di-kin. Bihesibîne tu kurê xwe li

li ser dînyayê û ji ber çavên wî rabûbû, ronahîyeke seranser li hemberî wî bû. Belê çavên Sîno hê ne elimîbûn rona-hîye. Çav û mejiyên wî her tişt ji hevdû cuda nedikir. Bi kîmasiyan hesiya. Zor da xwendinê û pirse.

Tegihîşt ku wekî berê ji mamosteyê xwe yê gund hez nake. Wekî berê nedîcû cem wî. Ü carina ji xwe li nedîtinê datanî. Ew havîn di nava vala-hîye de derbas bû. Dawiya havînê ser êvarekê bihist ku gerîla ketine gund. Gerîla gundi li meydana gund civan-dibûn. Li dor sîh cil kesi bûn. Keç û xort tevî hev bûn. Se-rokê gerîla digot: "Em ji bo we dixebeitin, em ji bo jiyane-ke pak û rûmet xwe didin kuştin. Bi vir û derewen dewletê bawer nebin. Nebin qori-cî, hevalbendiya dewletê nekin, neçin eskeriyê, divê hûn alîkariya me bikin!" Gerîla digot divê ku hûn dizî û fesadi-ya hev nekin. Em bibîhîzin ki tişten wilo xerab dike, em ji wan re zanin.



midêmûm." Bi rastî Sîno ji, Sîno bû ha...

## SILÊ Û HÊVIYA WÎ SÎNO

Ji gelek hevalen xwe jêha-fitir û biaqil bû. Mamoste Sîno, ji Silê re gotibû: "Tu xatîre kurê xwe zanibe. Ü wî bi-de xwendin." Bi Tirkî gotibû: "Vatanina millefîne layîk, fay-dali bîr evlat olacak, yalnız o-nu bölgüelerden korumalisin." Silê bi ku ve diçû û li ku rûdi-nişt, peyv dianî ser xwendina kurê xwe. Ü peyvîn mamoste bi Tirkî ji ber digot. Gotineke mamoste ya din ji bi serê Silê Eysanê ve heliqibû. Mamoste gotibû hûn li her alî bi Kur-mancî dîpeyîvin. Ka Kurman-cî bi kêrî ci tê. Sîno li dibis-tanê hînî tiştan dibe, hûn bi Kurmancî diaxîvin, kurik xwe şas dike û ji bîr dike. Pişti vê şîret Silê, li malê Kurmancî qedexe kiribû. Ji jîna xwe Mekiye pirr diqehîri. Gazin ji wê dikir. Digot: "Matirûmê hînî Tirkî bibe Tirkî!"

ser kîsê xwe bişînî dibistanê ka ji te bi ci dibe mal. Ew ne dosten we ne. Li ser hesabêن Ürisan û Ermeniyan dixebeitin, ne yê karê, lê yê xesarê ne." Silê digot: "Bi navê Xwedayê jorîn tu rast dîbîjî. Ka eme şîrhalêl nolî te li ku bibînîn."

Mamoste poşman vejeri-ya. Sîno bi ya xwe kir. Ji di-bistana dewletê ya belaş veqe-tya çû ya qezayê.

## SÎNO GUHERÎ

Sal wergeriya zivistan û bi-har derbas bû. Serê havînê dema bêndera Sîno hate gund. Sîno axaftina Tirkî berda bû. Li ser zimanê Kurdi mijûl dibû, Sîno her tişti dipir-sî. Li ser diroka gund, li ser a-deten Kurdan, li ser danûstan-dinên gundiyan. Qala têko-sînê, serhildanê, berxwedanê dikir. Çend rojname û pirtûk bi xwe re anîbûn. Her tim ew dixwendin. Bi zarokên gund re qala şoreşî ji dikir. Hişê Sîno tevî hev bûbû. Dînyayeke din hatibû an ji perdeyeke reş

Dibistan vebû çû qezayê. Sala wî ya sisîyan bû. Serê gerîla û dewletê giran bûbû. Li her alî êdi qala ser dibû. Dibihist bi qeflan keç û xort diçin tevî gerîla dîbin. Li dibis-tanê pevcûneke dirêj di nava xwendevanan û mamosteyan de pêk hatibû. Édi wî didit mamoste hemû ne weke hev in. Hin ji wan alî gel in. Baş têgihîşt ku dewlet li gel neheq e. Dewletê serê taybeti dijwar di-domand.

Bi hevalen xwe re qala zilmê dikirin. Li riya xelas-bûnê digeriyan. Çend belavokên bi dizî ketibûn desten wî. Belavokê, xort daweti ser dikirin. Sîno, ji ser û kuştinê hez nedikir. Dixwest, bêkuştin û bêşer şahî pêk bê.

## KULA SÎNO

Dîsa havîn hat. Sîno çû gund. Gundiyen Sîno ji destê leşker, polis û qoriciyan ne di tu halî de bûn. Cendirman gotirtin ser gund. Her carekê

deh bîst mirov kom dikirin, di-birin işkencyeyê, bi lêdanê ew ji mirovatîyê dianîn der. Gundiyen mala xwe bar dikirin.

Serbaz doza qoriciyî li gundiyan dikir. Gundî civiya-bûn û biryara xwe dabûn. Gundê wan bê qelihandin ji, nabin qorci. Sîvanê gund nan û av dibr ji gerîla re. Sîno ji şîven re got rojekê min ji bi xwe re bibe. Bersiva şîven kurt bû. Nabe! Sîno difiki û digot hew riyeck maye. Ew ji şer e. Sîno nizanibû bi kijan riye tevî ser bibe.

Wê rojê ajaneke xwe gihan-dibû cendirman. Cendirme bi rext û tivingan, bi cemse û qayzêran dora gund girtibûn. Serokê cendirman di hewsa dibistanê de bi mamoste re di-peyivî. Çend cendirman li dor wan ew diparastin. Sîno xwe di axurê de veşartibû. Veşartin bi wî tade hat. Li xwe da-nanî. Got tirsek xwe ve-dişerîn. Rabû ji axurê derket û bi guman êrişî serokê cendir-man kir. Cendirman lê reşan-din. Sîno bazda çû xwe gi-hand malê ku demançeya bavê xwe hilde. Ji ber çavan winda bûbû. Mamoste got: "Min ew nas kir. Ew Sîno ye û ez mala wî dinasim, bimeşin ez malê pêşî we bikim." Cen-dirman dora mala Sîno girt. Diya Sîno Mekiye xwe avêt ber lingê serbazê cendirman.

"Got ew zarok e, Xwedê wî nehèle. Ezê bi desten xwe bi-dime we." Serbazê cendirman emir da. Bi bazoka li xêni dan. Xanî li ser Sîno hil-weişandin. Gundî li meydana gund kom kirin. Xeber, fort û lêdan... Sê çar xort û çend gundiyan din girtin, birin.

Wê şevê di televizyonê de wi-lo hate gotin: Li filan bajarî, li filan gundi; di navbera eşqi-ya û leşkerê me yê qehre-man de şerek çebûye. Di vî şerî de eşqiyyayek bi kuşî bi dest ketiye. Neh eşqiya ji bi saxî xwe dane dest û gelek çek ji bi dest ketine, leşkeren me bi şopa eşqiya ketiye...

Ez gihiştîm gund. Tarî ne-kebibû erde. Kûçikên gund di-reyan. Asîman di nava sorayı-yekê de bû. Te digot dilopek xwîna Sîno li asîmanê hêşin ketiye û xwîn belav bûye, Sîno di tırbê de razayibû. Diya wî Mekiye bi dijûna çubû erde, bi destan kevirê nava axê dineqand. Hêstire çavê wê bi giranî xwe berdîdan jêr. Li meydana gund, gundiyan gotin ev çend roj e ku Mekiye ji ser mezel nehatiye. Min destê xwe li stûye Silê Eysanê gerand û em meşyan. Siya me ya dirêj di pêsiya me de; me pêl siyê dikir û em bêdeng dimeşyan. Silê got: "Qesasê kurê min mamosteyê wî ye. Em careke din ji xapiyan....."

Şev geriya, Mekiye li ser mezel bû. Silê di pencerê de li mezel mîze dikir. Dûxana çi-xareya Silê ber bi asîmanê sa-yî ve hildikişîya.



Netewe namirin, ew bi xwe  
xwe dikujin.

Gotina Pêşîyan

### KÊ CI PEKAND?

"Ez bi Gonzalez re li ser modela Bask'ê  
nepeyvîme. Bask ci ye? Ez nizanim"

Serokwezîra Tirkîyeyê  
Tansu Çiller

# Hiştira 'terorîst'



Hiştir jî bûn qurbanêng rengêng kesk û sor û zer!


Wisa dixuye şerê li Kurdistanê ku, ev neh sal e didome xedariyek mezin gihandiye psikolojiya endamên hêzên dewletê yên leşkerî. Edî zû bi zû hedana wan li ber tiştîn ku. Kurdiyê tîne bîra wan nayê. Cari na ji ber vî awayî bûyerên ecêb diqewimin û mirov bêhemdi xwe bi wan dikene.

Ev bûyera dawî jî yek ji wan e. Ji bo merasîma vekirina riya di navbera Siwerek û Amadê de hin wezîrîn hikûmetê têne vexwendinê herêmê. Wezîrî Mafen Mirovan Mehmet Kahraman, Wezîrî İmaretê Onur Kumbaracibaşı û yê Tûrîzmê Abdulkadir Ateş. Serokê Belediyeya Ruhayê û xwedîyê

fîrmaya ku, rê çekiriye çawa dibihîzin ku, dê ji Enqereyê wezîr werin, hema bi lezgîni ji Qerejdaxê bi buhayê 12 milyon pereyê Tirkî hiştirekê (deve) dikirin ku, li ber piyêñ weziran serjê bikin.

Bi dilxweşîyeke mezin hiştira xwe dajon meydana ku, dê tê de merasîm çê bibe. Bes problemeke ku ne li hêviyê bûn, derdikeve pêşîya wan. Di devê meydanê de polîs hiştire digirin û binçav dikin. Sedem jî ewe ku, hiştir bi benik û qordeleyen kesk û sor û zer hatiye xemilandin.

Gelê ku li meydanê civiyane tu mane li vê tewra polîsan bar nakin û ji wan dipirsin ku, ka gelo çîma wiha dikin. Bersîva polîsan wiha ye: "Ev hiştir bi van rengan propagandaya PKK'ê dike." Û dest bi vekirina qordele û benîken bi hiştire ve girêdayî dikin. Pişti ku, hiştire ji van rengan delîlê cudaxwaziyê xelas dikin, didin xwedîyê wê. Di vê navê de wezîr bi yek dengekî daxwaz dikin ku, hiştir neyê qurbankirin. Bi vî awayî jî hiştir ji qurbanbûnê xelas dibe.



## 'Olimpiyata 2004'an bila li Stenbolê çêbe'

Olimpiyata sala 2000'î Komara Tirk kar nekir, lê ya sala 2004'an, garantî wê li bajarê Stenbolê çêbe.

Li bajarê Stenbolê, li navçeya Emînönüyê ev 45 roj in ku, pakîşkarân (çöpçü) Belediyeyê di girevê de ne. Sedemê greva karkeran jî ji ber ku, ev 3 meh in ku, meaşê wan, ji aliye Belediyeyê ve nehatîye dayin. Navçeya Emînönü, ji aliye aborî ve ji geleb ki pêş ketîye.

Gava ku, mirov di kolan û kuçeyan de derbas dibe, ji bêhna genî gêj dibe. Ji bo vê yekê jî xebatkarân Belediyeya Emînönü di nava kuçe û kolan de li ser koma zilgo wiha nivîsandine. Bila olimpiyata 2004'an, li Tirkîyê bibe. Gava mirov çav bi van dikeve, mirov xwe nagire û dibêje gelo wê o-

limpiyata 2004'an çawa li Tirkîyê û li bajarê Stenbolê çêbe. Lê wexta ku, em cûn me xwest ku, wêneyen kuçeyeki bikşînin, yek nêziki me bû û wiha got: "Ev olimpiyata han ya 2004'an, wê ji bo gemarê, bê avakirin, wisa dixuye."

Tirkîye ji vî ali ve favoriya yekemin e, dîmena keçe û kolanen Stenbolê cavên mirov dîdelîne. Yekî din jî hat cem me û wiha got. Hevalno baş bikşînin wêneyan, heke ku, şerma Tirkîyê piçek ji hebe ev eyb besi wan e û ezê tiştîkî din jî bibêjim, heta ku, rojnameya Hürriyet û li vir bû, bi fetl û futa belediyê dixapand û nedîhişt ku, ewçend li ser hev bicivin. Lê niha wan jî ji vir barkiriye, xwedê li halê me xwedî derkeve.

## Min got û negot

Sûc ji qebehet mezintir e. Serokwezîra me ya delal, di geşta xwe ya Avusturyayê de dermanê doza Kurdi dîtibû. Bi lez û bez hate malê û derman eşkere kir. Lê general û tevî Bavo terpûsek li nava serî dan. Deng jê biriya. Tansu Xanim bi Felipe Gonzales. Serokê dewletê İspanya re peyivibû. Gonzales hatibû hawara wê. Derman "Modela Bask'ê" bû.

Jûjî...

Doğan Güzel



## Xoce xapandin

Xoce Necmettin Erbakan hêda xwe ku, here ber perrê esmanan lê, Xwedê ji xêmnexwazan qet ne xweş be, jê re bûn asteng. Kirin ku, Xoceye me yî dîndar û delal xwe bispêre generalan.

Ew kesen "bawermend" nehiştin ku Xoce averê bibe û çav berde iqtidarê. Çavnebarî her bela ye. Jixwe Xoce qet ji wan kesan nefiliti. Her jê re dibin dirî û strî. Niha jî di Kongreya

Caremin de kirin ku, miradê wî di çavê wî de bimîne û kesen wek Korkut Özal, Abdulkadir Aksu, Ali Coşkun û hwd. bikevin bin perr û basken Xocé a-xirê zeman.

Pêşî rê li Xocé me yî camêr girtin û ew spartin generalen Kemo İsmetî Kerr. Vê carê, ji dilnexwazên Xoce re kew li darê ket. Dê bibêjin: "Jixwe me dizanibû ku, Xoce nepak e, kiras ji bejnê şiqitî."

# Pirsgirêka Kurd wek agir e


**Navenda Nûçeyan-** Pirsgirêka Kurdi li Tirkîyeyê mîna agir ki dest diavêjê xwe dişewti. Mirovên ku dibîn ev pirsgirêk bi destê artesê çareser nabe û li gorî xwe li dû çareseriyen siyasi digerin. zû an dereng ji cihê xwe dibin, an jî bi destê kontrgerîla têne kuştin. Hin ji wan ji pistî ku ji aliye artesê ve têne tehdîtkirin, ji pêşniyarênen xwe vedigerin û edî der barê pirsgirêka Kurdi de nema dengê xwe derdixin.

Iro wek mirina Turgut Özal, li ya Adnan Kahvecî ji bi şik tê nîherîtin. Hin belgeyên nû nîşan didin ku, dewlet di mirina Adnan Kahvecî de gelek tişt vesartîye. Rapora ku der barê qezayê de hatibû amadekirin ji bi temamî derew derket. Ebûqatê Adnan Kahvecî diyar dike ku, ger Kahvecî hatibe kuştin, sebebê wî dosyayênu ku li ser dixebeitî ye. Weke tê zanîn Adnan

Kahvecî li ser pirsgirêka Kurdi raporek cihêreng amade kiribû û tê de çareyên siyasi dinir xand.

Li aliye din di nav artesê de, yênu ku aligirêq qetliaman in bi xwe ji, di hin tiştan de li hev nakin û serekî dijwar di nav wan de ji didome. Kuştina Or-general Eşref Bîtlis ku Serokê Giştî yê Cendirmeyan bû, enca ma dijberiyen di nav wî û serokên din ên artesê de bû. Eşref Bîtlis bi xwe, li Kurdistanê qetliamîn girseyî diparast, lê nelîhevkirina metodên qetliaman serê wî ji xwar û bi sûîkas-tekku li balefîra wî hatibû kirin, ew ji kuştin.

Di dema şerrawestina PKK'ê ya yekali de, çareserkirina siyasi di nav rewşenbir, nivîskar û rojnamevanen Tirk de ji gelek hate guftûgokirin. Di wê deme de, hin kesan bi wêrekî ditinê xwe pêşkêş dikirin. Pêwestiya



Turgut Özal



Tansu Çiller

çareseriya siyasi ji aliye pirraniye ve dihate parastin. Lî pistî ku dewlet şerrawestinê bi qetliaman bersivand û PKK'ê ji nû ve dest bi şer kir, hemûyan xwe ji nû ve quncifandin û nema li derveyî ditinê artesê deng ji wan derket.

Di nav hikûmeta nû de ji, wek hikûmeten kevin ev pirsgirêk di xala yekemîn de cihê xwe digire. Car bi car ji nav hikûmete an jî partiyen din, hin dengen muxalîf dertê, lê dengê wan zû tê birrîn. Ev kesen ku di beyanen xwe de li çareyên leşkeri bi şik dînihîrin ji, di wê kîliye de têne tehdîtkirin û pistî bi rojekê mecbûr dîminin ku xwe bi xwe derewin derxin û beyana xwe înakar bikin. Ev ji bo hemû kesan eynî ye. Ci serokkomar, ci serokwezîr, an wezir û mebûs, hemû mecbûr in ku li gor ditinê artesê beyanan bidin û her tim pistgiriya xwe ji artesê re pêşkêş bikin. Artêsa Tirk ji kes an partiyen nêz û dûrî xwe li gor ditinê wan ên der barê pirsgirêka Kurdi de dinirxîne. Kijan hêz, partî, nivîskar, rewşenbir, politikyan bi kurtî ki dibîla bibe ger ne li gor ditinê artesê bilive, ew neyar e û zû an ji dereng bi awayekî piyê wî/wê dişemite.

## DEMÎREL Û "REALİTEYA KURDI"

Serokkomarê niha Süleyman Demirel, di dema hilbijartina giştî ya dawî de ku berendamê serokwezîriyê bû, di beyanen xwe de qala "Realîteya Kurdi" dikir û digot: "Em vê realîteyê dinasin". Lî pistî hilbijartîne ku DYP û SHP bi koalisyonê hatin iqtîdarê û Demîrel bû serokwezîr, ev gotinên wî zû hatin jîbirkirin û ji wê rojê pê ve nema tu kes ji devê Demîrel vê peyvî bibîhize. Baş e, ci bûbûku Demîrel ji gotinê xwe direviya? Diyar e ku, ew ji weki herkesi ji aliye artesê ve hatibû tehdîtkirin û weke her carî fotera (şewqeya) xwe û pê re ji ew beyana xwe li ba generalan ji bîr kiribû. Iro Demîrel ji herkesi bêhtir li hember kesen ku der barê pirsgirêka Kurdi de ditinê cihêreng pêşkêş dikin, derdikeve. Ji her kesi bêhtir bûye peyayê generalan û ji herkesi bêhtir qetliaman diparêze.

Li Tirkîyeyê guherînê bi vî rengî ne ecêb in. Di rastiyê de ev bûye taybetiyeke bingehîn ji bo politikyan, nivîskar û rewşenbirê Tirk. En ku doh pêşkîya demokratbûnê ji tu kesi re nedîhiştin. Iro newêrin serê xwe ji qalikên xwe derînin. Tirsa artesê, dil û cegera wan di-

hin mafêñ din ên demokratik dikir. Lî pistî ku Ciller beyana xwe înakar kir û serî ji generalan re tewand, dê ev bername çawa bê mesandin, tu kes nizane. Wisa xuya dibe ku, dê di rojen pêş de guftûgoya li ser pirsgirêka Kurdi, an serê hinekan an ji serê hikûmete bixwe.

## MODELÂ BASK'Ê CI YE?

Li İspanya, li herêma Baskê, sistemeke ji yê İspanya cihêtir tê ajotin. Li vê herêmê rayeyen rèveberiyen herêmî ji yên din zedetir in, wekî din parlementoyek herêmî heye û hemû problemen Bask'ê di vê parlementoye de têne çareserkirin. Perwerdehî bi zimanê zîmkâr ye û weşanen Baskiyan ji bi zimanê wan e. Teví vî awayî pirsgirêka Bask'ê bi temamî çareser nebûye, lê di riya çareseriye de gavêñ girşing têne avêtin. Heta 10 sal berê Baskî ji van mafen xwe yên xwezahî mehrûm bûn. Di nav rîexistina çekdar û Baskî ETA û hêzîn leşkeri yê İspanya de şerekî dijwar didomiya. Hikûmeta Felipe Gonzales, pistî ku, hat iqtîdarê politikayen ku, heta wê rojê hatibûne meşandin bi temamî guhert û dest bi mafdayînen demokratik kir. Bi vî awayî ji tundiya ser sist bû û niha hema hema şerekî berbiçav nîn e.

## ROLA AMERİKAYÊ Û GERA CILLER

Serokwezîr Tansu Çiller, li gorî ku rojname dinivîsin, ji bo alikariya çek û telafikirina zera-ra Tirkîyeyê ya ku ji ber ambar-goya li ser Iraqê pêk tê, dice Amerîkayê. Li aliye din, bi armanca ku, kampên PKK'ê bêne tesbîtkirin û sopandin, dê ji Amerîkayê balefirê Awacs û peykêñ casûs bêne xwestin.

Weke tê zanîn Amerîka, bi hemû hêza xwe alikari dide Tirkîyeyê, da ku di şerî li hember PKK'ê de serfiraz bibe. Lewre iro PKK li Rojhilat Navîn ji bo Amerîkayê ji, bi hêz, birêxistinî û ideolojiye xwe talûkeya herî mezin e. Lî Amerîka, politikayen Tirkîyeyê yên li hember pirsgirêka Kurdi napecjirîne. Dixwaze Tirkîye bi hin mafen demokratik desteka gel a bi PKK'ê re qui bike, bi vî awayî ji PKK bi tenê bimîne û tasfiye bibe. Li aliye din, aligirê PKK'ê li Amerîkayê ji tesir li Kongreyê dîkin û pirsgirêka Kurdi dixin rojeva wan. Rojnameyên Amerîka ji niha ve li hember politikayen hov ên Tirkîyeyê weşan dikin. Li Kongreyê Amerîka ji, li hember politikayen Tirkîyeyê dengê parlementeran bilind dijin. Ji niha ve çekën ku Amerîka, dide Tirkîyeyê bûne problem, tê gotin ku, ev çek li hember Kurdan têne bikaranîn û divê alikariya çekan bê rawestandin.

Wisa dixuye ku, Tirkîye di têkiliyên xwe yên bi Amerîkayê re de ji dikeve astengiyeke mezin û hêdi hêdi di qada navne-teweyî de ji tê tecritkirin.

Tansu Çiller, di rewseke wiha de dest bi gera xwe ya Amerîkayê dike, li wê derê ji, pirsgirêka Kurdi dê di xala yekemîn de bê guftûgokirin û dê Ciller li pêşniyarê Amerîkayê guhdarî bike

## ROJEVA WELÊT

### Tîştê ku nayê dîtin ci ye?

Lî Tirkîyeyê der barê pirsgirêka Kurdi de çareseriye demokratik ji nû ve bi sıftî rojeye dagirtin. Serokwezîr Tirk, li gera xwe ya Ewrûpa, pistî hevdîtineke bi Serokwezîr İspanya Felipe Gonzales re, ji bo çareseriya pirsgirêka Kurdi modela Baskê pêşniyar kir. Ü qiyamet ji pistî vê beyanê rabû. Serokkomar Süleyman Demîrel û serleskeriya Tirk, teví nûner û serokên partiyen rastgir bi tundî li hember vê pêşniyarê rabûn û pistî bi 2 rojan ji Tansu Çiller beyana xwe înakar kir û ji sozê xwe vegeyî.

Politikyan, nivîskar û rewşenbirê Tirk ji, ji nû ve dest bi guftûgoya çareseriya siyasi kirin û dîtinê xwe yên li ser modela Bask'ê pêşkêş kirin.

Tê dîtin ku, di rastiyê de teví beşek ji serleskeriya Tirk ji fêmkirine ku, pirsgirêka Kurdi bi darê zorê çareser nabe û her dike berfirehtir û dijwartir dibe. Lî ji ber ku hin tiştan nabînin û di teşhîsên xelet de israr dikin, kontrol her di destê artesê de dimîne û ew ji, ji darê zorê û qetliaman pê ve ji tu tiştî fêm nakin.

Tîştîn ku, nayêne dîtin ci ne? Beriya her tiştî, divê bê zanîn ku, dermanê çareserkirina pirsgirêka di destê gelê Tirk û Kurd bi xwe de ye. Pêdivî bi çareseriye ithal nîn e. Ger qedexeyen li ser guftûgokirina meseleyê rabin û herkes dikaribe dîtinê xwe bi awayekî azad bîne ziman, dê di riya çareseriya pirsgirêka de, modelen herî rast disa ji nav civakên Kurd û Tirk derkevin.

Xeletiya din a herî mezin ji, nedîtin û înkarkirina hêza azadiya gelê Kurd û rîberê vê têkoşînê ye. Politikayen ku, iro têne meşandin li ser bingehê jihevqutkirina gel û PKK'ê ye. Ji bo pêkanîna vê ji, gundê Kurdistanê vala dikin, gundiyan ku, naxwazin ji gundê xwe derkevin dikujin, bi provakasyonên kontrgerîla bi ser gundan ve digirin û qetliaman pêk tînîn. Wisa bawer dikin ku, dê bi vî awayî PKK'ê ji desteka wê ya lojistik mehrûm bîhelin û PKK'ê bigedînin. Lî tiştîn ku nabînin ev e; PKK ne tenê ji hêleke, an çend gund û navçeyan destek digire û ne tenê li Bakur xurt e. PKK iro bûye hêviya Kurden her car parçeyan û yên li dînyayê belavbûyi. PKK û gel wisa bi hêsanî ji, ji hevûdin qut nabin, lewre iro hemû Kurd xwe bi vî navî ifade dikin. Li tu derê dînyayê ji şerîn rizgariya neteweyî bi kuştin û qetliaman nehatine temartin. Tu hêz nikare neteweyeke hişyarbûyi ji têkoşîna wê dûr bike û serfiraz bibe.

Ev rastî iro xwe di mejiyê mijokdar de ji bi cih dike. En ku bawer dikin ku, dê meseleyê bi riyan leşkeri çareser bikin û di vî şerî de biserkevin, ne gelek dûr e ku, xwe li hemberî dadgerê dîrokê bibînin û bêne darizandin. Lî em wisa bawer in ku têkoşîna Kurd, rastiya xwe dê di serê hemû kesî de bi cih bike û daxwazên xwe, zû an ji dereng bide qebûlkirin.

En ku iro ji bo çareserkirina pirsgirêka li modelen ithal dijerin, dê sibê mecbûr bîmînin ku, li gorî dîtinê gel çareseriyen li gorî rastiya herdu civakan qebûl bikin û bi hêza azadîxwaz a gelê Kurd re li ser maseyê rûnin.

Ev yek cîqas zû bê dîtin, dê ew çend hindik xwîn birije û dê ciwanen di qada şer de, ji bo avakirina civakeke wekhev û azad ew çend zû dest bidine hev.

Divê bê zanîn ku, ji rastiyen dîrokî nayê revîn, ev rastî dibe ku, bi awayen nexweş ji xwe bi mirov bidine qebûlkirin; eman hay ji xwe hebin!

# Ji Sêwazê û wir ve çek û leşker hene

Ercan Kılıç

Mesrefen ku, ji bo leşkeriyê li Tirkîyeyê tê kîrin, hemû ji bo şerê li Kurdistanê ye. Ji sala 1989'an bi vir ve, para artêsa Tirk a di xezîneya (butçeya) wê de her sal, ji sedî du sed (%200) bêhtir dibe. Li di gel vê yekê para ku, bajarên Kurdistanê ji xezîneya Tirkîyeyê û ji dahata neteweyî ya nesafî ya hundîrîn distîne, ber bi sifirê ve dice. Ev yek ji dide nîşan jî ku. Komara Tirk mirinê, xelayê û xizaniyê dibe Kurdistanê. Para ku bajarên Kurd ji dahata neteweyî ya nesafî ya hundîrîn (DNNH) di nav 0 û 0. 49 de ye. Ev rews, ji bo bajarên Tirkîyeyê di seriya 1.50 de ye. Li metropolen Tirkîyeyê wek Stenbol ev reqem 23.30, li İzmirê 8.13, li Edenê 3.28, li Enquerê 7.02, li Bursayê 5.58 e. Ev reqem di sala 1993'yan de li bajarên Tirk her bêhtir dibe, lê li yên Kurd kêm dibe.

Para Stenbölê ji hemû bajarên Kurd zêdetir e

Li gorî reqemên 1988'an herêmîn Kurd dîsa ji yên Tirk kêmîtir parê ji dahata neteweyî ya nesafî ya hundîrîn (DNNH) distîne. Dîsa ev hej-



mar gava ber bi sala 1993'yan ve tê ferqa navbera herêmîn Kurd û Tirk zêde dibe. Mînak Herêma Marmarayê ji DNNH'ye, li gorî hejmarên sala 1988'an ji sedî 57.03 standiye. Para ku bajarên Kurdistanê standine 7.19 e. Dîsa li gorî sala

1988'an li bajarên Kurd serê mirovê ji DNNH'ye 0 û 250.000 Lîrayê Tirk dikeve. Ev rews ji bo bajarên Tirk di navbera 500.000 û 1.000.000 Lîrayê Tirk diguhere.

Belkî Tirkîye ji ber ku serê mirovê zêdetir (li gorî stan-

**J**i bajarê Sêwazê bi wê ve bi tenê çek, leşker, polîs, tîmîn taybetî, balefir, tanq û firoke diçin. Serleşkeriya Tirk, hesabên ku li ser enflasyon û rîgirtina li ber bilindbûna wê û butçeya 1994'an tê kîrin, serobino dike. Li ser daxweziya Serleşkeriya Tirk a 50 trilyon lîrayê Tirk, ji niha ve hate diyarkirin ku, wê sala 1994 ji bo gelê Tirkîyeyê bibe saleke windabûyi.

dartên dînyayê) leşker, polîs, tanq, firoke, balefir, tîmîn taybetî dikeve, reqorê bi dest bixe. Lewre para xerc û mesrefen leşkerî di butçeya Tirkîyeyê de, ji sala 1989'an bi vir ve ji sedî 200 bêhtir bûye. Di sala 1989'an de para artêşê di butçeyê de 4.3 bûye, lê ji

ber daxwaza 50 trilyonê din ji aliye serleskeriyê ve ev reqem li gorî 1994'an dibe ji sedî 86.

Di nav 50 trilyonê ku, Serleşkeriya Tirk xwestiye de, mesrefen personelên artêşê ne tê de ye. Dema ev heqîqeta mesrefen artêsa Tirk a ji ber şerê li Kurdistanê em bidin ber çavê xwe, ev hejmar hin bêhtir mezin dibe. Lewre xebat têne kîrin ku butçeya serleskeriya Tirk derkeve 86 trilyonî. 36 trilyon ji bo xerc û mesrefen personelên artêşê, yê din ji ji bo diravdaniyê (tehsîsatê) tê xwestin.

Ji aliye din ve, ev daxwaziya ku, ji hêla Serleşkeriya Tirk ve kîrin bûye sedemên gengeşî û guftûgoyan di navbera Serleşkeriya Tirk. Wezareta Maliyeyê û Heyeta Plankirina Bilind de. Dê biryara wê ji aliye Serokwezir Tansu Çiller ve bê dayin. Gava em evdbûna Çillerê ya ji artêşê re bidin ber çavê xwe, dixuye ku, wê biryara dayîna pereyan bê dayin. Ev yek ji tê wê wateyê ku, hîn bêhtir çek, xwîn, hêstirê çavan û zîlm para gelê Kurd bikeve ji butçeya Tirkîyeyê.

## Kuştina 6 TDKP'vanî

**N**ûnêrên ERNK'ê yên Ewrûpayê dan xuyan ku, li dijî tu mirov û rîx-istinan tewreke wan a taybetî nîn e û naxwazin li Kurdistanê pest û pêkutiyê li ser tu hêzên çepgir û pêşverû bi meşînin.

**Navenda Nûçeyan-** Li ser bûyera ku, di 9'ê Cotmehê de, li gundekî Xozata Dêrsimê qewimî, tê de 6 cekdarên TDKP'ê (Partiya Komunist a Şoreşger a Tirkîyeyê) hatin kuştin û 4 ji bîrîndar bûbûn, nûnêrên ERNK'ê û TDKP'ê bi daxuyanen cihêreg, dîtinên xwe, der pêş kirin.

Nûnêrên ERNK'ê yên Ewrûpayê dan xuyan ku, li dijî tu mirov û rîxistinan tewreke wan a taybetî nîn e û naxwazin li Kurdistanê pest û pêkutiyê li ser tu hêzên çepgir û pêşverû bi meşînin.

Li aliye din nûnêrên TDKP'ê ji daxuyanek weşandin, di vê daxuyanê de tê gotin ku, ew dê ji bo tolhindanê tu livbaziyan pêk neynin. Dîsa di vê daxuyanê de idia dibe ku. PKK dixwaze di nav hêzên pêşverû de şer derxe û tişten bi vî renge, zirarê didin doza gel.

Nûnêrên ERNK'ê wiha gotin: "Tu tewra me ye tay-

beti li hemberî TDKP'ê an ji rîxistineke din û li hemberî mamosteyen pêşverû nîn e. Şerê gelê Kurd ji bo azadiya gelê Tirk e ji. Lê em nizanin ji bo ci mirovîku, wek kujyarê İbrahim Kaypakaya tê nasîn û kujyarê hînek mirovîn welatparê e ji, ji aliye hînek kesan ve tê parastin û kuştina wî tê protestokirin. Rojnameya Aydinlik'ê di demeke ku, çapemniya Tirk pêbawerbûna xwe windakiriye digihîje hewara dewletê û dev diavêje tevgera azadiya gelê Kurd.

Wek tê zanîn, li gundekî Xozatê di nav gerîla û endamên TDKP'ê yên çekdar de şer derketibû û di vê bûyerê de 6 endamên TDKP'ê hatibûn kuştin. Li gorî daxuyaniya Serleşkeriya ARGK'ê ya Eyaleta Dêrsimê, hêzên TDKP'ê piştgiriya Serokê Belediyeya Dêrsimê kirine û ji bo belavokekê êris birine şer komik gerîla.

## Polîs jîneke reben kuşt

Cendekê jînekê, bi navê xwe Çiğdem Olgun ku, dayika sê zarakan e, li Göztepeyê, li taşa Küçükbağkalköyê roja 11'ê Cotmehê, li ser cihekî nependî hate ditin. Pişt re kîf bû ku, ew bi destê polîsekî hatîye kuştin.

Li gorî agahiyê ku, bavê jînikê dan, bûyer wiha qewimî: "Em bi erebeya xwe ji Mersin'ê dihatin. Dema keça min xwest derkeve destavê, em li cihekî ku, kes nedixuya, rawestîyan. Çiğdem ji bo destavê cû cihekî nependî û pişti demekê du jinan xebera kuştina wê anîn, plakaya erebeya, kesê ku, ew kuştine ji, bixwe re anîn. Paşê em hîn bûn ku, ew kes polîs e. Ev ci welat e ku, polîs jîneke destvala, bîsedem bikuje. Em wişa texmîn dikin ku, wî de-



Çiğdem Olgun

vavetiye keça min, wê ji jê re çer kirine û ew tişt bûye sede-

me kuştina wê.

Polîsên qereqola Küçükbağkalköyê ji pejirandin ku, kesê ew jînik kuştîye, ji qereqola wan e û navê wî. Adem Yardimci ye, gotin ku, dozger der heqî wî de doz vekiriye. Lê çiroka ku, wan der barê bûyerê de vegol, dişibe wirê dewletê.

Çawa ku, dema mirovek di işkenciyê de tê kuştin, berdevkên dewletê dibêjin, nizamîm ji qatê çendan ketiye xwarê, yan ji serê xwe li kijan dîwarî xistiye, ew ji dibêjin polîs xwestiye koma jînîn li wir, belav bike, ji bo tırsandînê şesara xwe derxistiye, daye dû wan, di vê navberê de lingê wî şemitiye, ketiye û şesare agir hilaniye, lê wî nedîtiye ku, li tu kesî an kesan ketiye.

## Li Batmanê bermahiyê dîrokî

**Welat/Batman-** Li Batmanê, li gundê Dahlikê (Kaletepe) ku li ser navçeya Hezoyê ye, di xebatên arkeolojîk de bermahiyê dîrokî hatin dîtin. Di van xebatên ku, ev sê sal in ji aliye Profesorê Zanîngeha Delawere ya DYAY'ê (Dewletên Amerika yê Yekbûyi) Michael Rosenberg û tevî ekîba wî ya ku ji 5 kesan pêk tê ve tê meşandin de, li Girikê Halençemî û Xanî bermahiyê dîrokî yên berî zayînê

(B.Z) bi 10 hezar û 6 sed salî hatin dîxin. Ji xeynî wan di kolanê de peyker (heykel), hestiyên sewalan, kodil: û berhemîn hunerî ji hatin dîtin. Prof. Rosenberg daxuyand ku, pişti Eskîfê di bin avê de bîmîne, dê av vê herêmî ji bide ber xwe.

Mesrefen heyeta arkeologen Amerîkî, ji aliye Weqfa Zanist û Cografya ya Nete-weyî û Zanîngeha Delawer ve tê dayin.



# Di nav gelê me de efsaneyaya kulê

**D**i biwêjän de kul dikeve dewsa gelek motifên kevnare yên mítolojîk. Mînak: Xwînmêt, yezdan, felek, ruhistîn, cin, mirin, tirs, nexweşî, birûsk, tarîfî û hwd. Di van biwêjän de kul bi gelek motifan ve tê temsûlkirin. Di efsane û mítolojiyên ku der heqê kulê de tê gotin di wande jî rol û rewşa kulê tê ber çavan. Her wekî em dixwazin ku, bingeha kulê bibînin û kul ji ci tê û gelê Kurd ev motif ji ber ci derxistiye bibînin.

## EVİNDAR

Di dîroka Kurdish de jiyanekî bi şer û ceng heye û ev bûyer li Mezopotam.yayê çêbûye. Ew mítolojiyên ku, hinek gelên Mezopotamyayê lê xwedî derdi Kevin, em dikarin bibêjin ku di van mítolojiyâne de keda Kurdish hin bêhtir berbiçav e. Gilgameş, Newroz, Efsaneyaya Kûmarbî û hwd. Ev Mítolojiyên han di nav gelê gerdûnê de têne zanîn û pîr tê nasîn. Li ser van mítolojiyâne herkesi gorî xwe nivîsiye û nirixandiye. Lê hinek nivîkarên me yê bi huner ji, di van mítolojiyâne de afîrandinê gelê Kurd derxistîne holê. Ji van kesan Cemîd Bender cihekî pîr girîng digire. Der heqê van kevneşopêne me yên kevnare de Birdal Aksoy hinek tespitên balkêş dike, Selahattîn Mihotulî li ser van mijaran pirtûkele hêja amade kiriye. Lê nivîskar X.Xemgîn di pirtûka xwe ya bi navê" Kürdistan'da dîni i-nançlar ve etkileri" de (Li Kürdistanê baweriye olî û bandorêne wê) der heqê baweriye Kurdish de agahiyêne pîr hêja xwendevanan. Her wiha li ser van mítolojiyên me yê gelêri pîr xebat hatine kirin û hê ji berde wam dikin. Lê hinek mítolojiyên me yên ne naskirî henin û em ji wan bêpar in. Lewre ev efsane û mítolojiyên me yên kevnare û nenas çand û wêjeya Kurd a gelêri pîr dineqîşîne û bilind dike. Iro li Kurdistanê hinek efsane û mînakîn mítolojiyê hene û hê tu kesî ev çandîn kevnare nekolayê. Jê tê zanîn ku ev motifên gelêri bêne ber-sivandin û bêne çapkirin yê di canda Kurdish de cîhekî giring hilde. Ji van berhemîn kevnare yek jê mítolojiya KUL'ê ye.

## KUL Û MÍTOLOJÍ

Di nav gelê Kurd de hinek biwêjän (îdyom) Kulê henin û ev bûyer bala me kişand. Di fîrhengan de Kul wiha derbas dibe Kul: Jan e, birîn e, nexweşîneke têger e û pîr dijwar e. Ev rewş xwe di biwêjän Kulê de dide nîşan. "Kul li navê keve, qirra kulê li navê keve, kula min giran e û hwd." Lê der heqê kulê de me hinek mînakîn pîr giring dit û vê rewş em birîn ser bingeha kulê ya ku di nav gel de şax vedaye. Me di nav gel de wek sêst heb biwêjän kulê bi destê

SEMA FIGURÊN KULÊ YÊN GİTTİ.

Realita Girîn(Somut)

K U L L İ N G  
(Manivelâ)

Realita Razberi(Soyut)

K U L

NEXWEŞÎ	TIRS	BİRÜSK	TÜPİŞK	CIN	XWÎNMET	FELEK	RUHUSTÎN	XEDÂ
---------	------	--------	--------	-----	---------	-------	----------	------

FIGURÊN MÍTOLOJÍKİ								
Tirs	Mirin	Jehr	Birûsk	FIGURÊN WANAKI	Cin	Ruhustîn	FIGURÊN OLLA	Gin
Nexweşî			Tüpîşk				Xwînmêt	Felek

tê xuyan. Iro di gundan de bi çavekî tirs li vê bihukê tê nîhertin, her wekî ev bihuk a-jaleke reş e û dibiriqe, li ciya û zinaran pîr dixuye. Bi Tirkî ji vê kêzikê re MANİVELA tê gotin. Di nav gelê Tirk de ev kêzik nehatiye nirxandin, ango wek nirxandina Kurdish li ser nehatiye sekinandin. Li ba Tirkan ev kêzik ji wek wan

tariyê de diji û bi pirranî di cihênen tê (hêmî, rewşa) û teng de disekine. Wek cinan e, ew me dibîne, lê em wê nabînin. Bi zarokan vedide, cihênen ku pê vedide güzek e. Zaroka ku di kolanan de bi tenê bileyîze kul bi wê zarokê vedide. Wisa tê xuyan ku îmaja kulingê, dijwariya wê dem hatiye vegeryaye ser motifekî din

**B**îwêjän kulê jina Kurd derxistiye, bi hunerên wan ve ev biwêj hatine çekirin. Jina Kurd nîfirên xwe, şîret û pendên xwe bi van biwêjân dide beyankirin. Ev reaksiyon li hember zarokan û hinek mirovên virek û pesindar têne holê lê wisa jî ecêbmâyîna mirovan, heskîrina wan a li ser tiştîn nebûyi, rewşa mirovan ya li ber sîrûstê û hwd. tê ber çavan. Mînak: "Kul devê xwe devê teke" di vê biwêjê de kul ketiye dewsa xwînmêt.

kêzikîn din e. Paşê Kurd li ciyan têne best û beyaran, li zozanen fireh dihêwirin û bajaran dadimezirîn. Di demekekin de dibin bajaran. Gelê Kurd ev çanda xwe ya li serê ciyan bi hatina bajaran ve bîr dike û hember wê dîtin û nêri-neke nû derdixe holê. Bi hatina bajaran ve, motifa kulingê ya li serê ciyan tê guhertin û dikeve rewşeye cuda. Dem tê îmaja kulingê ji muhayila (zîhn) zarok û jinan derdikeve. Lew di jiyana Kurdish a bajaranî de kuling tê guarîn û dibe kul. Kul ji ber heyala kulingê derketiye, her wekî îmaja kulingê; dem hatiye ji mejîyan rabûye. Dayîkên Kurd ji bo zaroken xwe bitîrsîn û nehêlin ku, zarok derkevin kolanan dianîn wan bi kulingê didane tîrsandin. Her wekî ku hatine bajaran wê demê îmaja kulingê vegerandine kulê û zarok bi kulê dane tîrsandin. Kul ciye? Li gorî jina Kurd kul, di

ü ji ber motifekî girîng hatiye çekirin. Her wekî motifa kulê li ba jina Kurd ji bo zarok tir-sandin û ji bo nîfirên tê bikaranîn.

## BIWÊŞ Û NIFIR

Li gorî tespitên me, jînîn Kurd motifa kulingê guhertine û ew ji heybereke objektif derxistîne, kirine motifekî razber. Ango motifa kulingê dibe kul û cihekî girîng distîne. Dema zar nehs dibûn derdiketin kolanan, jina Kurd zaroka xwe wiha ditîrsand: "Kuro neçe kolanan nereve, heya tariyê nemîne. Di tariyê de kul bi mirovan vedide û dikuje." Ev tespit xwe di gelek bûyeran de dide nîşan, lê mirov dikare bibêje ku kul ne motifekî zar tîrsandin ye. Lê dibe ku motifekî nîfirê be, lew di biwêjân kulê de ev rewş bi hêsanî tê xuyan. Însan hemû reaksiyo-xwe û hêrsa hindurê xwe

bi van biwêjän kulê didine der. Lewre ev biwêjän kulê wek nîfirân in, nîfirên pîr dijwar tînîn ziman. Em dikarin bibêjin her biwêjän kulê reaksiyonâ mirovan dide nîşan û ev biwêj dewsa gelek têkiliyên mirovan digire.

Biwêjän kulê jina Kurd derxistiye, bi hunerên wan ve ev biwêj hatine çekirin. Jina Kurd nîfirên xwe, reaksiyonâ xwe, şîret û pendên xwe bi van biwêjân dide beyankirin. Ev reaksiyon li hember zarokan û hinek mirovên virek û pesindar têne holê lê wisa jî ecêbmâyîna mirovan, heskîrina wan a li ser tiştîn nebûyi, rewşa mirovan ya li ber sîrûstê û hwd. tê ber çavan. Mînak: "Kul devê xwe devê teke" di vê biwêjê de kul ketiye dewsa xwînmêt.

## 'KUL WERE SER TE'

Rola kulê di vê biwêjê de hatiye xuyan, devê kulê heye û devê xwe dixe devê mirovan û li xwîna wan dimije. "Ci ditîrsî kulê li texe" di vê biwêjê de ji kul ketiye dewsa cinan, lê di nav gel de biwêjê ke bi vê biwêjê re wekhev ji heye "Ci ditîrsî cinê li texe" ji ber wê em dizanîn kul di dewsa motifa cinê de hatiye bikaranîn. "Kul rihê te bistîne, kul te re kuderê ye? Kul were ser te û hwd. Di van mînakîn biwêjän Kulê de ji kul ketiye dewsa ruhistîn, her wekî di nav gel de ji tê gotin "Ruhustîn rihê te bistîne, ruhistîn were ser te. Kul te bikuje. Kulê kuştî û hwd." Di van biwêjän de ji rola kulê wek rola yezdan e. Lewre kuştina ku kul di vê biwêjê de pêk tîne wek kuştina ku xwedê bi destê xwe biqedîne û ev ji di mítolojiyâne de derbas dibe. Agirê Kulê bi mala te keve, afata Kulê mala li bavê tekeve. di van biwêjän de kul ketiye dewsa birûskê û agir. "Kul pê vedayî" de ji Kul ketiye dewsa dûpişkê. Di van biwêjän han de reaksiyonâ jina Kurd xwe dide nîşandayîn. Jina Kurd van biwêjän bi nîfir ji zaroken ku şîr namijin, digirîn, nehs dibin, di cihênen xwe de nasekinin, li kolanan digerin û diçin mirîşkên cîranan dikujin re dibêjin. Di bikaranîna van biwêjän de jina Kurd di hundîrê hinek dilînên erînî û neyînî de dimîne, pîwist e ku ev biwêj li gorî wateya xwe bêne bikaranîn.

Di der mafê biwêjän Kulê de me hinek tespitên kin dane kirin lê em dê niha ji qala efsaneyen ku Der mafê Kulê de têne gotin bikin. Di biwêjän de Kul dikeve dilqê gelek motifekî mítolojîk, her wekî ev biwêj giş yên reaksiyonâ ne û li hember zaroken nehs û hinek mirovan têne gotin. Em dixwezin niha ji der heqê efsane û mítolojiyâne Kulê de hinek mînakîn bidin.

**Wê bîdome**

# Dewlemendiya Kurdistanê bû bela serê wê

Kurdistan ji aliyê çavkaniyên xwezayî ve dewlemend e. Li Rojhilata Navîn û li Rojhilata Nêzîk çend welat hene ku, ji aliyê aborî ve pîroz in û bi çavkaniyên xwe yên av û niftê (petrol) ew dikarin xwe idare bikin? Kurdistan jî, ji wan weiatan yek e.


Ew guherînê ku di îklîmê (sîrîş) de pêk têr ku, ji sariya Alpînê diçin ger miya tropikalê, hilberînê çandî û cotkariyê hem ji aliyê qalîteyê ve û hem jî, ji aliyê çiqasîyê ve guhertiye, dewlemend kiriye. Genim, birinc, nîsk, ceh, xamkesan û fêkî cihekî girîng digirin. Qalîteya titûnê bêsaloxdan e.

Di zemanê berê de çiyayê Kurdistanê ji aliyê daristaniyê ve gelek dewlemend bûn. Ew dewlemendi xweşikbûneke bêqiyas dida dilan. Lî iro ev çiyayê hêja di nav newal û gelyen hêşîn û ajotî de rût û tazî disekekin. Di jér û qûntarê Çiyayê Zagrosê de darê mazî, hewr (spîndar) bizû, benav, çinar û hwd. herêmê malava dikan.

## DEWLEMENDIYA XWEZAYÎ

Ew dewlemendiya daran li ba Kurdan ji bo daran evîndariyeke mezin afirandîye ku, mirov vê li cem cînarêne Kurdan nabîne. Evîndariyeke wiha ku, xwe di nav helbest û gundêne Kurdan de dide nîşan, xwe ji cînarêne Kurdan dide cihêkirin. Di van çiyayê dewlemend de ew aboriya ku, serdestiyê dike, aboriya kevnêşopî ye. Bi gotineke din aboriya avahiya kevin û serdar e. Di mehêne zivistanê de cihêne dikevin hundir ji aliyê berfî ve têr girin ku, berf demeke dirêj li ser erdê dimîne û ji bo çavkaniyên avê cihekî girîng digirin.

Gotineke Kurdan heye dibêje: "Ne Ereb û rez, ne fileh û pez." Ev gotina pêşîyan dide diyarkirin ku, Kurd çiqas girîngiyê didine çandinî û sewal xwedîkirinê. Li Kurdistanê çalakiyên herî zindî çandinî û xwedîkirina pez û dewêr e. Ev yek jî, bi morfolojiya Kurdistanê ve, bi erdnîgariya wê ve girêdayî ye. Morfolojiya herêmê ji bo xwedîkirina mihan, bizinan, hespan, keran bi kêt e. Mih ji sewalên malê yên herî girîng in. Ji hirî, goş û ji şîre wê, celeb bi celeb penêr, mast tê çekirin.



Li Kurdistanê berhemên dîrokî jî gelek in, lê...

Mihêne Kurdan her çax li bazarêne Tirkîye, İran, Iraç û Sûriyeyê têr firotin.

Ji bo xwedîkirina pez giyanî li ser "sinor"ê Tirkîye û İranê ye. Ji ber ku, li wir mîrgen pîr fireh û dewlemendîn hene. Ji aliyê din

de cihekî girîng vegirtiye. Babeta "Kurdê xas" ku, di wêjeyê de derbas dibe, bûye semboleke dîrokî ji bo kevneşopan û rewşa jiyanê. Ev sembol xwe dirêjî jiyana hezar salî berê dike.

Dîroka Kurdan a nûjen ji

der dorêne bajaren Mazra (Elezîz) û Sêrtê kom bûne. Tewqêne (tebeqeyen) kromê ku, li navçeya Madenê ne, di nav tewqêne dînyayê, yên li ser erdê yek ji ya girîngtiyîn e. Ji berê ve ye ku, sıfir li navçeya Amedê Erxenê


**D**i zemanê berê de çiyayê Kurdistanê ji aliyê daristaniyê ve gelek dewlemend bûn. Ew dewlemendi xweşikbûneke bêqiyas dida dilan. Lî iro ev çiyayê hêja di nav newal û gelyen hêşîn û ajotî de rût û tazî disekekin. Di jér û qûntarê Çiyayê Zagrosê de darê mazî, hewr (spîndar) bizû, benav, çinar û hwd. herêmê malava dikan.

ve tahde û serdestiya hikûmetên herêmê li ser Kurdan, li gorî deren din kêmter e.

## JIYANA HEZAR SALAN

Sivan û jiyana wî ya koçerî di wêjeya Kurdistanê

**G**otineke Kurdan heye dibêje: "Ne Ereb û rez, ne fileh û pez." Ev gotina pêşîyan dide diyarkirin ku, Kurd çiqas girîngiyê didine çandinî û sewal xwedîkirinê. Li Kurdistanê çalakiyên herî zindî çandinî û xwedîkirina pez û dewêr e. Ev yek jî, bi morfolojiya Kurdistanê ve, bi erdnîgariya wê ve girêdayî ye. Morfolojiya herêmê ji bo xwedîkirina mihan, bizinan, hespan, keran bi kêt e.



Ji çiyayê Kurdistanê zift û petrol dipijiqe, bes, beredayî heba dibe.

îcadêne mînerale binê erdê bi taybetî çaxa ku bi herêmê dorhêlê ve bê berhevdan nayê vegetandin. Li Kurdistanê çavkaniyên bînerdi li gor deran ne kêm in. Fosfat, sıfir, hesin, krom, komir, neft (petrol) li bakurê Kurdistanê, li

hatîye dîtin. Petrol li Reman, Xerzan û Amedê hatîye dîtin. Ji sedî heftê (%70) petrola İraqê ya xam li başûrê Kurdistanê derdikeve. %70 Kerkük, %5 li Aynsalah û Xaneqîn.

Li Rojhilatê Kurdistanê (İran) petrol li herêma Kermansahê derdikeve û ji bo zêhakirina (xerckirina) hundîrîn tê bikaranîn. Ji bo aboriya Sûriyeyê jî Kurdistan gelek girîng e. Ji ber ku, erdê wê deşt e û geleki bi jûn e. Bi vê yekê re ji, tewqêne petrolê di aboriya Sûriyeyê de girîng in.

## PİSESÂZÎ PÊDIVIYE

Ji bo Kurdistanê pîsesazî (endistrî) pêdiviyek e. Ew pîsesaziyen ku hene, ji aliyê pêşveçûnê ve di radeyeke nizm de têr nirxandin. Bi pirranî ew cewherên berxwarinê yên ku,

têkiliyên wan bi hilberînê çandeyî re hene, têr afirandin.

Her çend Kurdistan ji aliyê çavkaniyên bînerdi ve dewlemend e ji, gelê Kurd ji bijûniya erdê xwe, ji dewlemendiya ava xwe tu sûdekê (feydeyekê) nabîne. Ew tiştêne ku têr afirandin ji li gorî vê dewlemendiyê di radeyeke pîr jér de dimînin. Ev rewş ji bo seranse-riya Kurdistanê wiha ye. Ji ber ku ew polîfikayen aborî yên ku, hikûmeten navendî bi kar anîne, kanêne xuristî (xwezayî) ji hêla gelê ciwarbûyî ve nayen bikaranîn. Bi gotineke din ji kanan dijmin sûdê dibînin. Lewma ji welatekî dewlemend fena Kurdistanê iro ji hemû weleten ku, li Rojhilatê Navîn in, jîrtir e (desteng) û paş vemayı y.

## IRO KURDISTAN JI HEV KETIYE

Kurtasiya vê ya herî girîng ev e ku, Kurdistan ji hev ketiye û yekbûna xwe pêk neaniye. Jihevbelavbûna Kurdistanê, yekîtiya aboriya wê ku di bin bando-riya İmparatoriya Osmanî de hebû, xera kiriye û gemirandiye.

Sînorêne çekirî ku, di nav Tirkîye û İraqê de hatin afirandin, barkirina koçeran qedexe kiriye û nahêlin koçer ji cihekî herin cihekî din. Ew sîtembariya han ku, bi kotekeyan koçerên Kurd cîwar kirine, li ser aboriya wan hîkariyeke mezin cê kiriye.

## DAGIRKERIYÊ KURDISTAN LI PAS XIST

Sînorêne siyasi ne bi tenê Kurdistanê ji hev vediqetîne her wiha aboriya wê ji. Bi vî awayî jî herêmên dewlemend ji hev re têr girtin û izolekirin, her herêm dibe girêdayîye weletê serdest a ku Kurdistanê dagir kiriye.

Dewleten ku Kurdistanê parve kirine, kanêne wê bar dîkin dibin navendiyen xwe yên hilberînê. Ji ber vê ji cudabûneke girîng di nav Kurdistan û weleten dagirker de pêk hatîye. Armanca barkirina kanan, paşxisin û bêrûmetkirina Kurdistanê ye. Kurdistan ji bo "mijokdariya hundîrîn" mînakeke girîng e.

**Nişe:** Ev nîvî ji pirtûka MIRELLA GALLETI ya bi navê "I curdi nella storia" hatîye wergirtin û ji aliyê Gavan Koçer ve li Kurmancî hatîye wergerandin.

Niviskarê destana 'Leyl û Mecnûn'

# Xaris Bitlîsî

**D**estana Xaris Bitlîsî "Leyl û Mecnûn" ji aliyê M.B. Rûdenko ve di sala 1965'an de bi tercuma Rûsî hatiye çapkirin. M.B. Rûdenko ji bo destana "Leyl û Mecnûn" pêşgotinek nivisiye. Ew dînivîse ku, Xaris Bitlîsî di sala 1758-59'an de destana xwe "Leyl û Mecnûn" nivisiye.

## Seyitxan QURÎJ

Xaris Bitlîsî di sala 1758'an de ji dayik bûye, lê sala mirina wî ne kif e. Bi gotina **A. Jaba û M.B.Rûdenko** Xaris Bitlîsî du destan nivisiye. Destana "Üsif û Zelixa", "Leyl û Mecnûn". Li gorî lêkolîvanê Kurd Prof. **Qanatê Kurdo** destana "Üsif û Zelixa" berê **Salîm Sulêman** nivisiye, lê paşê Xaris Bitlîsî destana wî cih bi cih wergerandiye, peyvîn Fârisî û Erebi derxistîye pak kiriye, gîhandîye zargotina Kurdi. Bi gotina A. Jaba li navbera sedsalya XVII-XIX'an de li medreseyen Kurdistanê nivsarê Xaris Bitlîsî "Üsif û Zelixa" dihate xwendin.

Em li jêr çend nivsarêن Salîm Sulêman û Xaris Bitlîsî li hemberê hev didin.

## Ji destana Salîm Sulêman

Ema bi sedat û bi envan Besê bikin em ji pîrê kenan, Ev reng ji axretê di mezherî, Yûsif bi cemal bûye meşhûri

**Ji destana Xaris Bitlîsî**  
Ema bi sedat û bi envan Besê me dikin ji pîrê kenan, Ev reng ji lawê wî di mezhori, Üsif bi rindî zehf bû meşhûri.

Destana Xaris Bitlîsî "Leyl û Mecnûn" ji aliyê M.B. Rûdenko ve di sala 1965'an de bi tercuma Rûsî hatiye çap-

L êkolîvanê Kurdî Qanatê Kurdo di pirtûka xwe ya bi navê Tarîxa Edebiyata Kurd de dînivîse ku, destana Xaris Bitlîsî mîna destana Nîzamî ye. Ew şaxên destana "Leyl û Mecnûn" ku, Kurdên koçer ji zarokê Erebanbihîstîne û di nav xwe de belav kirine, dibe ew şax li nav Kurdish mabe û bûbe bingeha destana Xaris Bitlîsî. Destana Xaris Bitlîsî cihbi cih ji destana Nîzamî cu-

rokiye, girînekê bûye, rind, bedew û aram bûye. Leylê û Mecnûn li mektebê kitêbên xwe bi nev diguherin, da ku bi vê wesileyê rastî hev bê, hev bibînin. Mecnûn postê miya li xwe dike ku, tevi kerîya pez here cih û warê Leylê û Leylê bibîne. Di destana Nîzamî de serpêhatiya "Leyl û Mecnûn" ne mîna ya Xaris Bitlîsî ye. Di destana Nîzamî de çend mirov hene ku, di destana Xaris Bitlîsî de nayên gotin. Mesela navê **Sellam Amirît û Selam Bexdadi**. Li gorî Prof. Qanatê Kurdo Xaris Bitlîsî destana "Leyl û Mecnûn" xweser nivisiye, ew ne tercuma destana Nîzamî ye.

*Ne mumkun e eşq bêt  
nêhanî  
Henek hebitin, heye  
e'yanî,  
Şagirt di hucrê pê bi  
yek bar,  
Bi cumle ji hal bûne  
xeberdar.*

*Ey doxtêra min, eva ci  
kar e?  
Ev kar ji bo te zêde ar  
e,  
Ferze ji te re hub û  
perde  
Royê te kesek bibîne  
derve,  
Bike te heyn hezar aşiq  
Aşıq bona te ne layq.  
Leylê sekinî çadıra xwe,  
Ev renge xiste xatira  
xwe,  
Ku carek biçe lay Mec  
nûn,  
Kanê bi ci hale ew  
Cegerxûn.*



## JI NÇM'Ê BERHEMEKE NÛ

Ji nav xebatê NÇM'ê berhemekê dim jî afirî. Koma Mezrabotan bi qaseta xwe ya duyemîn Kedkar re, dîsa deng li we dike.

Koma Mezrabotan, di muzîka Kurdî ya hemdem de rîça azadiyê.

**Navnîşana Xwestinê**  
Tarlabasi Cad. No: 128  
Beyoğlu/İST.  
Tlf: 254 76 28

**Mazlum Plak ve Kasetçilik**  
İMÇ 6 Blok 6525 Unkapanı/İST.  
Tlf: 512 26 65

# AZADÎ



Abdurrahman Durre

## Dîlber û Çiller

**D**îlber navê jineke gundi bûye. Hem rindik û xweşik bûye, hem ji téra xwe şorek û şareza bûye. Axayê gundi jî pîr tolaz bûye. Dema ku di navbera gundiyan û axa de nexweşiyek û ixtîlafek derdiket, Dîlberê di xemîlandin û dişandîn cem axa. Dîlberê û axa ci dikirin, Xwedê dizane, lê Dîlberê ew karê ku ji bo wê cûbû muhaqeq hel dikir, paşê dihat. Dîlberê wilo axa hîni tolazî, kemkojî û teresiye kiribû ku, tiştekî pîr biçük jî çebibûya, heta Dîlberê neçuya mala axê û şevek-duduyan li ba axê nemana ew tiş çenedibû.

Gundi jî rind hîn bûbûn û riya xwe dîtibûn. Heta ku rojekê meseleyek giran di navbera axa û gundiyan de derket û gundi Dîlberê dîsa şandin ba axa. Lê axa êdî hem kal bûbû, hem ji, ji Dîlberê têr bûbû. Axa gazî gundiyan di ke û ji wan re dibêje: "Geli gundiyan! We heta iro bi qorika Dîlberê û bi şorektiyen wê her tişte xwe dimeşand û safî dikir. Lê, ji vir û pê ve êdî Dîlber û qorika wê ji pere nake û em ji hev re ji nabin. Divê hûn malen xwe bar bikin û ji gundi derkevin. De haydê biqeşitîn, bicehimin, dêlikâ xwe ji bigirin û herin." Dema ku wilo dibêje, gundi şaş dimînin û li çavên hev û din dinêrin. Rûspiyeke wan ê şareza û zîrek hebûye. Vedi-

**Dîlber li wan vedigere û dibêje: "Lê ezê ci  
bikim?" Dibêjin: "Tu ji  
tobe bike û pereyên te  
pirr in, here xwe biavêje  
mala Xwedê. Belki  
Xwedê te ji efû bike. Tu  
ji guneh i, êdî bes e  
qorika xwe li ba bike."**  
**Kalekî gundi dikene û  
dibêje: "Jixwe êdî qori-  
ka te ji bi kêri tiştekî  
nayê Dîlberê!"**

pêşkêşî axê kir, Dîlberê dişande balê. Heqê we ye ku her tişt bê serê we, mirov tufê rûyê we bike ji hindik e."

Li ser gotinê rûspiyeke gundi diponijin û radibin diçin malen xwe, civînan pêk tînîn û li çareyan digerin. Yek ji navâ wan xwenda û zana bûye. Dibêje: "Lawo! Dawiya viran li me hat, em êdî nikarin axê bixapînîn. Dîlberê ji, ji dest çû, êdî bi kêr nayê. Çare ew e ku, em bibin yek û vê xirabî û fesadiyê ji nav xwe derxin. Wekî mirovan bê minet û bê paxav ji axê re bibêjin ku, em birayên hev in, tu daw û dozêne me bi hev re tune ye, êdî pêdiviya (îhtiyaca) me bi axatiya te ji nîn e, gundi ji ne gundê bavê te ye, gundê me ye û em ji gund dernayê, tu êdî axayê me nîn i, axayê mala xwe yi."

Dîlber li wan vedigere û dibêje: "Lê ezê ci bikim?" Dibêjin: "Tu ji tobe bike û pereyên te pirr in, here xwe biavêje mala Xwedê. Belki Xwedê te ji efû bike. Tu ji guneh i, êdî bes e qorika xwe li ba bike." Kalekî gundi dikene û dibêje: "Jixwe êdî qorika te ji bi kêri tiştekî nayê Dîlberê!"

Di temsilê de çewti nebe, KT (TC) ji di her karê xwe de Dîlberê (Tansu Çillerê) dixemîline û dişîne cem axayê dînayê ku, meseleyen xwe yên aboriyê hel bikin. Meseleya Kurd û Kurdistanê ji, bincil bikin û veşerîn. Dîlbera wan a şorek ji, xwe dihejine û şorekiyan dike û axayan li xwe dicivîne. Bi vê armance di 7. 10. 1993'an de bi hemû şorektî û cilweyên xwe yên siyasi û jînitî teşrifî Viyanayê kiriye ku, der heqê mafêni mirovan de, axayê cihanê bixapîne û bi serê wan bixe ku, KT ji mafêni mirovan re ria yet dike û gurîtiya xwe terikandiye. Di televizyonâ Almanyâ de min ji li Dilbera KT'ê mêze kir ku bi rastî ji gelek şorekî û virêne qelew dikirin. Lî wê ji êdî bawer nedikir ku, êdî dikariba axayê cihanê bi şorekî, bi cîlwe û artistiyen xapînok bixapîne.


Çareya wê û KT'ya wê ya faşist ew e ku bibin mirov, wekî mirovan bi hemwelatiyên xwe yên Kurd re rûnîn û ji tu kesî ji tu hîviyan nekin, serêne xwe li ber tu kesî netewîn, xwe pêşkêşî axayan nekin. Bi şorekî û qorikhejandinê êdî ev tişt nayê bincikirin. Jixwe maneya peyva "Vi-ya-na" ji bi Kurdî "ev tişt nabe" ye. Hîviya min ew e ku, Dîlber (Tansu Çiller) vê yekê bibîne û vegere ser riya rast.

# Behdînan: Kela tirs û zîndana gel

Ev e bêhtirî du salan e ku, başûrê Kurdistanê ji bin destê dagirkerên Baas'ê derketiye, Kurd di nav xwe de jiyan û hikumraniya xwe dikin. Daxwaza gel ew e ku, derbasî qonaxeke baştır bibe, ew jiyana bindestiyê ya ku meşandin rabike. Di encamê de, bi baweriyeke serihilda û hin derfet bi dest xistin, nemaze piştî dam û deszgehêne rejîma Bexda yê rabûn, dixwaze ew ji weke hemû miletên cihanê di dîtin, fîkr û karêni jîyanê de bide û bistîne, xwe bi ser û ber bike, hêzê ji xwe re çebike, tevgirtineke xurt di gel rîveberiyeke dirust, bi sînceke nû û şerefa neteweyî û kesanîyek bi rûmet hilgire û cihê xwe bi serfirazî di nav mirovahiyê de bigire.

Lê ger em li rewşa siyasi ya başûrê Kurdistanê binêrin, emê bibînin ku, xwe bi gelek rengan dide diyarkirin, an ji bi ew valabûnen ku, bi zîlm û zorê di cîvakê de çê bûne dabigirin. İmperyalizm dixwaze başûr bibe bingehék ji bo biserhevanîna berjewendiyen xwe. Helbet siyaseta şerî taybetî xwe bi cih dike. Dagirkirêne Kurdistanê ji tirsa başûrê welat ku, gav bi gav ber bi serxwebûnê ve diçê û bi her awayî amade ne têkoshîna xwe bikin, di amadekevîn listikan de ne. Divê em baş bizaribin ku, ka welatêne dagirkir û imperyalizm ji me çi dixwaze.

Dema hikûmeta başûrê Kurdistanê çêbû, alîkarî ji van welatan xwest û stand, lê çîma nikarin kar û barê xwe bi rî ve bibin? Bi rastî bersiva vê pîrsê ji heye. Lewre desthilatî ne di destê wan de ye, ew dixwazin her tişti bixin xizmeta siyaseta xwe û hemû bi hev ve girê bîdin, belge ji bo vê çendê ev e: Ev du sal in ji bo çareseriya vê



Berê Sedam ev keleha li Dihokê wek zîndan bi kar dianî.

rewşê, lê çareseriya rewşê bi tenê di bin navê alîkarî û parastinê de têni diyarkirin.

Ger hikûmeta herêmê, di avahîya xwe de aloziyan xuya neke û xwe tênegihîjîne û pişta xwe bi milet girê nede, nikare aloziyên ku di hêla wan de dertên çareser bike.

Siyaset bi vî rengî berdewam bibe, bê guherandin cend qonaxan biçe, dê qonaxeke lê teng bibe, li dawî azadiya mirovan bêhêz dibe û dê demokrasiya gel bê bisînorkirin. Giriftariyên civakî zorê bigire ji lêdan, kêşa aborî û neserbestiya fîkr, dîtin û bizavkirinê, bi erzanî li xwedîyê bir û bawariyan didin, mafêni mirovan têne şêlandin. Ev rewş û rastiyen hanê, bi taybetî li devê Behdînan xwe didin pêş û giraniya xwe çedîkin, çîma?

Lewre bingehêne civakî ev alozi di nav xwe de berhev dikin û xurt dikin.

Hîzr û bîrên derebegatî û paşvemayı ku, siyaseta paşve-

rûtiyê ji xwe re cihîr dikin, valabûnan çedîkin, ji bo dagirkeren Kurdistanê. Wek dewlata Tîrk û karêni MİT'ê, an ji muxaberata Iraqê, da ku êrîş li ser mirovîn me yêndi Kurd ên weklatparêz pêk bînin. Weke tê za-nîn ev ramanê siyasa belgeyên bêçaretiyê ne. Li ser vê bînî gehê, rewşa ku tê de dijî naxwaze dev jê berde, da ku hebûna xwe xurttir bike, li başûrê welat berrameya şerî taybetî bi armanca dûrxistina gel ji şopa wî û pêşveçûna yekîtiya neteweyî hatîye amadekirin. Xurtkirina nakokî û nexweşîyen di navbera çîn û qatîn civakî de, secdekirina siyaseta imperyalizm û dagirkirêne Kurdistanê ye.

Dîsa dixwazin pîrsa Kurdî bi awayekî aborî bidin naskirin. Em dibejin ku, ev ne rast e, lewre em dizanîn welatê me bi

sererd û binerdê xwe ve têr û tijî ye, dewlemend e, lê di destê gel û vîna civakê de nîn e. Li

ser vê hîmî pîrsa me aborî nîn e, lê pirseke siyasiye, ji bo ku em di vê pîrsa siyasiye de baş têbigihêjin, em dikarin cend minâkîn praktîki bidin xuyan. Léxistin û şehîdkirina mirovîn wek Ali Şaban, Sadiq Omer, Ali Koxî, Muhammed Beybûn û hwd. ji ber ku nedîcûn ber bi siyaseta wan ve û fîkr û ramanê xwe diparastin bû û dîsa nehiştin ên wek mamoste Rauf Kamîl ku kesekî welatparêz, paqîj û xwedî bir û bawerîyên neteweyî û rewşenbîrî bû, derde mîlet dida ber çav, lewre ji nehiştin xebatêne xwe bidomîne. Bi sedan gotinêne tal û tûj jê re dişandin, da ku bitirse û dev ji xebat û hebûna xwe berde û bireve. Lê wî her rastiyê diparast.

Li ser van kiryarê teroristî, em dikarin bibêjin ku, li ser Behdînan şeveke tarî û bi tîrs û sawa xwe danî.

Ev terza siyasete jê re dibejin "siyaseta teqlîdi". ev siyaset bermahiyê dagirkirêne Kurdistanê

tanê ye. Lewre tu bernameyê wan nîn in ku li ser bimeşin, ji ber vê yekê neçar in li şopa mîratêne ku, dijmin ji me re hiştiye biçin. Ew dijminê ku, bi hezaran mirovîn me sirgûn dikirin, işkence dikirin, enfal dikirin û dixwestin hikmî xwe bi zorê li ser gel bimeşin.

Béguman ev siyaset iro di bin navê Kurdayetiye de têne zindîkirin, naveroka vê ev e: İro mîlet hişyar bûye û rîceke rast dixwaze, ku pêngav ji bo rizgariya xwe biavêye ku, ev ji tirseke mezin li ser neyar peyde dike. Helbet neyar naxwazin ku ev bîr û raman di nav gelê me de belav bibin.

Divê mirov bianibe ku, ew kesen ku di vê siyasete de cih digirin, ji van kiryarê pîs, çepel û neexlaqî yê ku, li ser civakê dimeşin berpirsiyar in. Kuştina mirovîn hêja û xwedî bir û bawerî li diji jîyanazadiya gelê Kurdistanê ye.

Li ser hemû kes, tevger, siyaseten radikal û welatparêzan wezîfe ye ku, kiryarê van kuştinan destnîşan bikin, da ku gunekar bêne dîtin û nehêlin dubare bibin. Di vê riye de neyarê Kurdistanê têne kuştin û divê dest ji wan neyaray neyê berdan heta ku, cezayê xwe bîdin gel û li ser rûpelên reş ên dîrokê navên wan bêne nîvîsin, bibin ders ji bo her kesê ku xiyanet li gelê xwe û netewaya xwe, rizgarî û azadiya xwe di-

**Nivîs: Azad Ehmed  
Guherîn Rojhat**

Jêrenot: Ev nîvî ji rojnameya Welat hejmara 10'an a ku li başûrê Kurdistanê bi tipen Erebi û bi Soranî derdiket û demek berê weşana xwe rawestand hatîye wergirtin.

## XACEPIRS

Ceperast: 1-Yek ji pêşekê Şoreşa Kübayê. Piştî şoreşê ji bo piştigiriya şoresserên wê çû Bolîvayê û li wir hate kuştin. Di nav hemû şoresserên dinayê de mîna sembolekê tê dîtin. Di wêne de tê dîtin 2-Nebuha/ Alîkar 3-Şemetok/ Cinavka kesane ya pirhejmar a yekemîn/ Navê oleke Kurdan 4-Bandor/ Hêt 5-Navê qanaleke televizyona İtalî/ Bernavê Serokê Amerikayê 6-Cinavka kesane ya yekhejmar a yekemîn/ Çiya 7-Şekl, dirûv/ Mengiraniyeke navneteweyî 8-Esalet 9-Navîşan/ Notayek 10-Navçeyeke Mêrdinê

Serejîr: 1-Bizav, wêrîn 2-Navê tevgera leşkerî ya PKK'ê ya yekemîn ku, serokê wê Egîd bû. Piştî şehîdkirina Egîd, navê tevgerê wek ARGK'ê hate guhertin/ Ezîyet 3-Xweperestî/ Fedî 4-Navê sewaleke ku bi pirranî di ajotina cot de tê bikaranîn/ Xem, derd 5-Navê rîxistineke NY'ê ku di warê çandiniyê de kar dike/ Sahîh, esseh 6-Hejmarek 7-Rengdêra îşarkî/ Rih/ Navê cemeki mezin li Misrê 8-Peyva dijberê "na"/ Nêxerîb/ Mam 9-Rêz 10-Rejîsorekî Japon .....Kurosawa 11-Berhemîn şîri 12-Hêstirbarandîn

## Amadekar: Rasto Zilanî



## BERSIVA XACEPIRSA HEFTIYA ÇÜYÎ

Ceperast: 1-Lenîn/ Çakûç 2-Êlek/ Şêwe/ Ez 3-Vot/ Xalid/ He 4-Keç/ Herekol 5-Rovî 6-Mak 7-Dîlegur 8-Awaz/ Lor 9-Sînem/ Nî 10-Al/ Kis  
Serejîr: 1-Lêv/ Dasî 2-Elok/ Sêwî 3-Netek/ Lana 4-Îk/ Mezel 5-Vag 6-Şah/ Kul 7-Çêlek/ Ronî 8-Awir/ Ris 9-Keder 10-Ko 11-Çehov 12-Zelî

## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînîn:**

**Li derive:** Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

**Li Tirkiyê:** 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînîn.

**Navnîşana Welat:** Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07


**Mercen abonetiyê:**

	Li hundir	Li derive
3 meh	60.000	30 DM
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM


Enstituya Kurdî ji bo alfabetê pirtûk weşand

# Binêre binivisîne birengîne

**Binêre!**  
**Binivisîne!**  
**Birengîne!**



Weşanên Enstituya Kurdî



Zarokno çavên we bi ronî. Enstituya Kurdî ya Stenbolê ji bo ku hûn bi hêsanî (rehetî) hînî alfabeja Kurdî bibin pirtûkek bi navê 'Binêre binivisîne birengîne' di nav weşanên xwe yên rêza perwerdehiyê de derxist. Wekî ku amadekarên pirtûkê jî di pêşgotina xwe de anîne zimên divê ev pirtûk bi pirtûka bi navê 'Xwendin ronahî ye' re bê bikaranîn da ku bêhtir bi kêrî we were. Ev pirtûka duyemîn jî - Xwendin ronahî ye - li gor daxuyaniya enstituyê wê di nav van

pazde bîst rojêne pêsiya me de derkeve û bigihîje destê we.

Enstituya Kurdî ya Stenbolê ji bo hînkirina zimanê Kurdî di pişî de giraniya xebatêne xwe yên weşanê daye ser pirtûkê hînkirina alfabeja û ziman. Van xebatêne xwe jî di bin navê 'Rêza perwerdehiyê' de ya yekemîn, ya dûyemîn û hwd. de pêk tîne. Berî du sê mehan, ji ve rêzê ya yekemîn bi navê 'Pirtûka wêneyan bi ABC' bi zara-vayê Dimîlî û Kurmancî weşandibû. Ev pirtûka di

destê we de jî ji rêza dûyemîn e. Pirtûk li gor zarokênu wê di pola (sinif) yekemîn de bixwînin hatiye amadekirin. Tîpê (herf) alfabetê li gor rézman û rast-nivîsa Celadet Bedirxan hatiye bikaranîn lê ne li gor rêza alfabetik hatiye amadekirin. Tîp ji serî heta dawî bi awayekî tevlîhev hatine amadekirin. Ev metod jî ji sistema perwerdehiyê ya ku niha li welatê Ewrû-payê têne bikaranîn û li gor pedagogan ji bo zarokan êdî baştîr tê hesibandin, hatiye standin. Her tîp bi wêneyê tiştekî ku bi wê tîpê dest pê dike hatiye nasandin û li gel wê jî ji bo bênen rengînkin wêneyen wan hatine xêzkin. Pirtûk ji 131 rûpelî pêk tê û bi kaxezekî baştîr hatiye amadekirin. Heke hûn bixwazin vê pirtûkê û yên din bi dest bixin hûn karin wan ji vê navnîşanê bixwazin.

**Navnîşana xwestinê:**  
Tarlabaşı Bulvarı, 128 Be-yoğlu / İstanbul

Hebû carek ji caran  
Rehme li miriyên guhdaran

Yek hebû yek tune bû  
Kîvroskek belek hebû

Geh li deşt û beriyê  
Geh li qûntara çiyê

Dikeve rez û xerzan  
Bax û bistan û werzan

Rez û werzê gundiyân  
Xera dike bêpîvan

Gundî li hev civiyan  
Li çarekê geriyan

Gotin: "Qet wiha nabe  
Rewşa me pirr xerab e

Wê kîvroska beleres  
Bi me nehiştin zebeş

Emê xefikan vedin  
Ji bo em wê bernedin"

Xefik û daf vegirtin  
Ji bo kîvrosk bê girtin

Lê rojek dido sisê  
Kîvrosk bi wan dilizê

Gundî rabûn ci kirin  
Tajiyek peydé kirin

## Tajî û kîvrosk



Tevan kirin palûte  
Bi nan û goşt û pûte

Tajî kirin weke mar  
Qelew û şemûs û har

Ji bitri lotkan dide  
Rabûn derandin seydê

Gerandin kolan kolan  
Li zinar û li çolan

Lat û lat devî devî  
Dar bi dar zevî zevî

Ber bi ber qefakê cûn  
Guhê tajî jê bel bûn

Kîvroskê pêjna wan kir  
Xwe li berojê wer kir

Ew tajiyê bitr û têr  
Xwe dike piling û şêr

Kete dû kîvroska bes  
Ji berojê dane kaş

Kîvroska wek lepeki  
Bi kêş ve hilperikî

Mîna berê tivingan  
Zor dide her çar lingan

Ji ser lat û kendalan  
Diqevizê tibaran

Weke teyran difire  
Kes nikare bigire

Tajî bû gurîfek rîs  
terrî li dû bû werîs

Li nîvê kêş westiya  
Ziman ji dev kişiya

Kîvrosk ra ser sekînî  
Bi halê wî dikenî

Tajî bi hêrs û bi fort  
Bi xeberên gelek çort

Got: "Ez têr û dagirtî  
Min çawa tu negirtî

Ku ez vêna fêm nekim  
Ezê vêga biteqim"

Piştî bêhna xwe berda  
Wiha bersiva wî da

Got: "Tajiyê bêmejî  
Tu neke pirsên rîjî

Ez ji bo xwe dibezim  
Canê xwe diparêzim

Lê beza te xuya ye  
Ku ji bo gundiya ye

Ku baskê te jî hebin  
Tu qet nikarî bi min"

Jîr Dilovan

Hozanê Kurd Osman Sebrî li Şamê çû ser dilovaniya xwe  
**Ronahiya Osman Sebrî, bêmirin e**

*D*i dîroka wêjeya  
gelê Kurd de  
hinek helbest-  
vanêh hêje û bi rûmet  
hene.  
*Van kesan çand û şaris-*  
*taniya gelê Kurd bi*  
*dinyayê dane naskirin û*  
*dewlemendiya rewşa baw-*  
*erî û toreyâ*  
*Kurd, zimanê wî, jiyana*  
*wî bi gelên din dane dîtin*  
*û nasîn. Ehmedê Xanî,*  
*Melayê Cizîrî,*  
*Melayê Batê, Feqiye*  
*Teyran, Pertev*  
*Begê Hekari,*  
*Cegerxwîn, Osman Sebrî*  
*û hwd ji van kesan in.*

**M. Zahir KAYAN**

Osman Sebrî, ji bo dilen Kurdistanê yên birîndar wek hetwanekê (merhemekê) bû, ew serhonazekî helbestvanan bû li Kurdistanê. Bi kesera Kurdistanê nivisi, têkoşin da û bi dili-niya xweşî û geşiyên Kurdistanê helbest afirandin. Hat girtin, îşkence dît, nefî bû , bindesti û bêkesî dît, bi rewşa gelê Kurd şewitî, keliya, têkoşin xurt kir. Roj hat ji bo şer, ji bo ji holê rabûna zilm û kotekiyê, da serê rê û dirban, xwest ku, here tevî destana Agiriye be, xwest ku, pişta kedxwir û paşverûyan bişkê. Ji bo vê armanca xwe ji destê wî ci hat ew kir. Carinan bi kesera welat, carinan di bin destê neyaran de wek teyreki ji qeflên xwe dûrketi, bi dilekî xemgîn ji rojê û cihanê re axîf. Helbestên xwe, nivîsarên xwe, ji kûraniya dilen xwe derxistin, lê ev kûranî ji birîna Kurdistanê dihat. Roj hat wek bihareke pîroz, bi hatina zivistanê re winda bû, ji çavan dûrket; lê ji dilan dûr neket, her wekî hat di text û payêن dilen me de wek gul û sosinêن Kurdistanê rûnişt. Li pey wî destanek ma, navê vê destanê "Osman Sebrî û Têkoşin e."

# **BERDEVKÊ REWŞA GEL**

Di dîroka wêjeya gelê Kurd de hinék helbestvanên hêje û bi rûmet hene. Van kesan çand û şaristaniya gelê Kurd bi dinyayê dane naskirin û dewlemendiya rewşa bawerî û toreya Kurd, zimanê wî, jiyanâ wî bi gelên din dane ditin û nasîn. Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Melayê Batê, Feqiyê Teyran, Pertev Begê Hekarî, Cegerxwîn, Osman Sebrî û hwd. ji van kesan in. Lê Osman Sebrî bi serê xwe jiyanêke dewlemend e, ew bi jiyanâ Kurdistanê ve girêdayî ye. Çiroka wî, rewşa Kurdistanâ



bindest ya hezaran salî, di xwe de dide xuyakirin. Hozanê mezin yê bi nav û deng Osman Sebrî, di 12'ê Cotmeha 1993 yan de ji nav me veqetiya û çûser dilovaniya xwe. Bi mirina wî re hemû Kurdistan kete rewseke xemgîn, her wekî Osman Sebrî, li Kurdistanê bi awayekî hêzdar tê naskirinê. Wî gelek herêmên Kurdistanê dîtine, bi gelê Kurdistanê re têkiliyên giring daye çekirin, bi diroka wî û bi toreya wî re mijûl bûye. Ew gelek caran di welatê xwe de bindest maye û di girtigehêن li ser axa Kurdistanê ku, ji aliyên neyaran ve hatibûn çekirin de, hatiye girtin û gelek işkence ditîye. Helbestên Osman Sebrî ji ronahîya dilên Kurdistanê derdikevin. Ew ji Kurdistanê tu car dûr nîn e. Di demeke xwe yên surgûnîde di li ser Dicle û Firadê didilopîne:

*Ji dil û kezeb evîndarê  
 Dicle û Firat im  
 Nizam bi çiqas bê dilê  
 xwe dûrî we dijim  
 Ev çem ji bakûr derdike  
 ve wek du welat  
 Yek ta Birecik, yê di dice  
 nav diyarê Zin  
 Melê Cizîrî îlhamâ xwe ji  
 vî çemî distand  
 Gelek mirari di peravên  
 Dicle de civand*

Prof. Qanatê Kurdo der barê hozanê mezin de, di pirtûka xwe ya bi navê " Tarîxa Edebiyatê Kurdi " de dibêje: " Li paş Cegerxwîn, şerê serê çiyayê Kurdistanê yên duyemin Osman Sebrî ye." Qanadê Kurdo dibêje: " Osman Sebrî di sala 1905'an de li gundê Narincê ku li ser Meletiyê ye ji dayîka xwe bûye. Di sala 1915'an de bavê wî çûye ser dilovaniya xwe, apê wî Şukri ew xwedî kiriye, daye ser xwendinê. Di sala 1922'an de Osman Sebrî dibistana "Ruştîyê" kuta kiriye. Herdu apên wî Şukri û Nûrî ji ber tekiliya soreşa Sêx Sehid di sala

1925'an de li Amedê (Diyarbekirê) hatine dardekirin."

Osman Sebri ji bo welatê xwe û ji bo gelê Kurd tékoşîne-ke mezin daye, her wekî li Kurdistanê bi gelek kesan re téki-liyên xwe xurt kirine, rêtixistin pêk aniye û wisa jî pênûsa xwe xebitandive.

Osman Sebri di gelek rojname û kovarên Kurdi de nivîsêne xwe dane weşandin "Hawar, Ronahî, Roja Nû û hwd. di vê mijarê de mînak in. Li gorî nivîsa Qanatê Kurdo Osman Sebri xwendina xwe û zimanziya xwe li cem Celadet Bedirxan hînbûye û di navbera salênen 1932 1945'an de hemû berhemên xwe di rojname û kovarên Kurdi de, yên ku ji aliyêni Celadet Bedirxan û Kamûrân Bedirxan ve derdiketin de didan weşandin. Wisa jî tê zanîn ku Osman Sebri ne tenê helbest nivîsîne, lê wisa jî di hêla pexşanê de berhemên giranbuha afirandine. Ew ji aliyevê din ve ji politikvane bi rûmet e, li gorî rewşa Kurd û Kurdistanê, der barê Rojhilata Navîn de xwedî hinek ramanêni zanisti ye.

Diwanike Osman Sebrî binavê "APO" ji aliyên tékoşerekî Kurd Hemereş ve di sala 1979'an de hatiye çapkîrin, lê di vê berhemê de hemû nivîsarên Osman Sebrî tunin. Ew der mafê pirtûka xwe ya bi navê "APO" de wiha dibêje: "Rojekê ji rojan nedihat bîramin ku, ev nivîsarên min ên ku, di nav cil û pênc salan de demeke xweser û rewşike kam-bax de hatibûn nivîsin û pirrani-ya wan di hin kovar û kitêbokên Kurd de hatibûn belavkirin, holê ku bigihîjine ser hev û di dirûvê kitêbekê de bêne çapkîrin. Berî her tîstî ez ne helbestvan im, lê geleki kîfâmin ji xwendina wê re tê û caran jî dinivîsim. Baweriya min ji fêde û qencyîa helbestan pirr he ye, ci dema helbest, an cîrok bi awayekî rêber û rînas

bêne nivîsandinê dikarin geleki  
serwext û hişyar bikin.”

**GOTINÊN XAV NAPIJIN  
BÊTAV...**

Osman Sebrî rewşa gelê  
Kurd ji nézik ve dibine û bi hel-  
bestan bersiva van pirsgirêkan  
dide. Ji ber vê yekê, li tu derê  
bi bingehî nikare bimîne. Li Tir-  
kiyeyê çend caran tê girtin di  
bin işkenceyan re derbas dibe.  
Osman Sebrî li ser vê bûyerê  
derbaşî Sûriyeyê dibe, li wi  
têkoşina xwe û riya xwe ya niş-  
timanperwîriyê bi awayekî xurt  
didomîne. Dîsa tê girtin û dari-  
zandin. Dixwaze here Kurdistâ-  
na Bakur, li Agiriyê piştgiriyeke  
bide şervanên Kurd, lê tê girtin,  
di girtîgehan de tê hencirandin.  
Neyar bi vî ji qîm nakin, wî dişî-  
nin Afrikayê li gelek herêman  
surgûnê. Neyaran ew timûcar ji  
welat dûrxistine, tu car nehişti-  
ne ew mirovên mezin li Kurdistânê  
bi dilekî ges bimîne û di  
nav gelê xwe de serfiraz be.  
Osman Sebrî dizanibû birfîna  
Kurdistanê cî ye û cîma pak na-  
be, wî gelek neyar kifşkiribûn.  
Ev neyar axa bûn, beg bûn,  
paşverû û sê neyarên dîrokî û  
hemdem bûn. Mijokdarên E-  
reb, Faris û Tirk...

## KESERA WELAT

Helbestên Osman Sebri li  
xerîbiyê, di bin îşkenceyan de  
hatine nivîsandin. Di van hel-  
bestan de kesera welat, negîhî-  
tin û têrneditina welatê bihuşt  
heye. Her rêzen helbestên wi  
de girîneke bi serîhîdan, wek  
birûsk, wek agir amade ne. Ga-  
zî keç û xortên Kurd dike, wan  
dawetî serr û cengê dike, kese-  
ra dilê xwe bi sirûşa Kurdistanê  
fine ziman.

Bi Qulingê re diaxife û hemû rewşa Kurdistanê ya kam-bax li ber çavan radixe. Osman Sebrî rizgariya Kurdistanê li hember nevaran, di ser û cengê

**L**ê Osman Sebrî bi serê xwe jiyanekê dewlemend e, ew bi jiyana Kurdistanê ve girêdayî ye. Çîroka wî, rewşa Kurdistana bindest ya hezaran salû, di xwe de dide xuyakirin. Hozanên mezin yên bi nav û deng Osman Sebrî, di 12'ê Cotmeha 1993 yan de ji nav me qetiya û çû ser dilovaniya xwe. Bi mirina wî re hemû Kurdistan kete rewşike xemgîn, her wekî Osman Sebrî, li Kurdistanê bi awayekî hêzdar tê naskirinê.

de didît. Welatparêziya wî bi  
çand û toreya Kurdi ve girêdayî  
bû. Wî di dawiya emrê xwe de  
gelek sal li Şamê mamostefî ji  
kir û di vê hêlê de, ci ji destê  
wî hat pêkanî.

Osman Sebri bi keser mir, bi kesera gelek xwestin û ramânê hêja, ew têr nebû ji evîna xwe. Neyar tu car nehişt ew bi evîna xwe şâ bibe. Bi çol û coban di binê destê neyaran de ma, lê ew newestiya, negiriya, netirsîya, baweriya wî tu car ji gelê Kurd sar nebû. Wek mirinê ji Kurdistan dûr diket carinan, carinan di dîwarên girtîgehê de xeyalên bêmirin di hişen xwe de disêwirandin. Ev giş dîrok e. Osman Sebri disa li sîrgûnê ye, Kurdistan xwîn dikele, neyar her der di xwin û girînan de hiştiye, ew şax û baxên rengîn di bin piyêñ neyaran de ax û fixan dikin, lê ew ji welat dûr e... Ji Kurdistan, ji Kurdistana çar par û ji Kurdistana Bakur. Wî nîvê dilê xwe li bakur hişt, bi kesera van deran şewiti, her wekî piçûkatiya wî li bakurê Kurdistanê derbas bûbû. Bala xwe dide xwe û li xwe mîze dike, lê dînhêre ku di welatê xwe de dil û bende ye. Kurdistan ji her aliye de hatiye dehibandin û xerakirin. Lê li sîrgûnê ye, helbestan diafîrîne, nîvisaran amade dike, xebatêniyasî didomîne.

Dîsa pêlên rûçikê Osman  
Sebrî wek pêlên oqyanûsan,  
pênuşa wî bi kesereke mezin  
"Quling" digot:

*Ho quling, kuda dici?  
Ber ve bakur kil dibî her  
Te rana hustiyê xwe, pêl  
bûn ji te pazîk û perr  
Ji bo çi te zû berdan beri  
demê ew germiyan?  
Qey dici nava welat, zo  
zanên Kurd serê çiyan  
De fermo, veniše, tu  
pêlekî em bipeyivin  
Hey e ku gelek najo li wi  
erdî em bicivin*